

ŞIVAN PERWER


MED-TV ya me ye...

M

iletê kurd
ji bo vê

gelek bedel daye
û bi rastî televîzyoneke wiha
çêkirin, ne hêsan e.
Ez wan însanan pîroz dikim,
ku televîzyoneke wiha
çêkirine.. Û ji wan jî
pir hez dikim.
Ez hez dikim û dixwazim ku
MED-TV bi pêş bikeve...
Lê divê mantalîte jî hinekî
were-guhertin. Divê em
hinekî ji hev re
bi tolerans bin, em bikaribin
hev û du rexne jî bikin.
Hinekî demokrat bin,
em karibin alîkariyê
hev û du jî bikin.
Em li hemberî dijminên xwe
sext û bi înad bin...

Rûpel 8-9



- ✓ MEHMET ASLAN, rastiya rûdana li Nisêbînê ku di 30'yê rêbendanê de, di mala wî de qewimîbû vegote me Rûpel 4
- ✓ Hemoyê biçûk hûn in, A. KESKIN bi rasernavê "Şiîrek û Şaîrek" Şêrko Bêkes da nasandin Rûpel 10
- ✓ Rêzenivîsa HESEN HIŞYAR ê rehmetî ya der barê Serhildana Şêx Seîd de didome û di vê hejmarê de li ser Kongreya Çiyayê Çanê tê sekinandin Rûpel 12-13

Cejna we ya Remezanê pîroz be

NAVEROK



6

Kurtegerînek li Ürisêtê, der barê kurdan de



11

Panel: Hereketa Şêx Seîd Efendî neteweyî bû



16

Jiyan li her derê jiyan e, lê bi çi rengî?

Ji Xwendevanan

DAXWAZA me ew e: Em jî, wekî hemû gelan jiyanêke însanetî derbas bikin û bijîn. Feqet, bêxêbat tu kes nagihîje armanca xwe. Em li vê derê bang li hemû kesan dikin; werin ji bona azadiyê, ji bona serfiraziyê û ji bona însaniyetiyê, xebata ku li ser me ferz e, em bikin. Çaxa ku her kes xebata li ser xwe ya ferz bike, dê wê çaxê emê bigihîjin armanca xwe.

RENGÎN
ŞIRNEX

ROJA 21'ê rêbandanê min ew stêra gelawêjê li bayiyê rojnameyan dît; min yek kirî û ez bi lez û bez çûm malê. Di nav rûpelên wê de wênayê Qazî Mihemedê nemir, Cegerxwînê xweştivî û şehîdê kal Apê Musa dûr û dirêj bala min kişandin.

Bêguman her sê jî, ji ber derketina Azadiya Welat kêfxweş xuya dibûn. Wan gelek xem û xeyal, biribûn nava axa sar. Weşandina rojnameyêke welatparêz berî hemû kesan kulîlkên dilê wan av dida. Jixwe çavên nemiran jî li neviyên wan e. Ji bo yê ku bizane û tê bigihîje bêhna hemwelatî, neteweyatî, dirok, wêje, çand, huner, wêne, muzîk, wekhevî, biratî û aştîyê ji nav rûpelên wê, diçe felekê.

Wekî daxwaza me coyêke kûr ji nebe, lê dîsa jî avê digihîne nav zeviyên beyar, axa hişk, rez û daristanên tîbûyî.

CEMBELÎ



Du Şivan

MEHMET GEMSİZ

Tîşteki asayî (normal) ye, kesên ku navên wan eynî ne, ji aliyê gel ve tene tevlîhevkin. Îcar ku ew kes navdar bin. Ev jî heye, yek bi hêsana dikare di bin siya yê din de bimîne. Hevpeyvîna bi Şivan Perwer re vê yekê anî bîra min. Gelê me jî her du Şivanan tevî hev dike; Dr. Şivan (Sait Kırmızıtoprak) û Şivan (Şivan Perwer). Heye bê gotin, "Çawa ev yek diqewime?"

Beriya Derbeya Leşkerî ya sala 1980'yan, tevgerên kurd bi piranî di nava gel de wiha dihatin binavkirin. Apocî, Şivancî, Kawacî, Ozgurlikçî û hwd.

Kesên ku pêgirê Dr. Şivan bûn, bi "Şivancî"tiyê dihatin naskirin. A ev yek bû sedem ku, gel her du Şivanan tevî hev bike. Ji ber ku, di wan deman de stranbêj û dengbêjên şoreşger zehf nebûn û Şivan Perwer bi stranên ku navroka wan neteweyî û şoreşgerî bûn,

derkete rastê, gel payeya "rêberê siyasî" jî dayê. Êdî ew, wekî siyasetvanekî, mîna pêşengekî siyasî bû ji bo gel. Hîna jî di civat û caxiyan de, ev pirs ji min tê kirin: "Çima Şivan jî di nava vê tevgerê de cih nagire? Ma ew jî doza mafên kurdan nake?"

Belê, ew baş nizanin ku her du Şivan, ji hev cuda ne. Heqê wan jî heye. Ji lew re, berê, çaxa kesên ku pêgirên Dr. Şivan bûn di nav gel de propagandê dikirin, rastî pirsra "Hûn ji kîjan berê ne?", dihatin. Wan jî, ji wê pirsê re, bersiva "Em Şivancî ne" didan. Şivan Perwer, bivê nevwê, li cem gelê kurd (ne tev) xwediyê statûyêke siyasî ye. Ew bêhtir ne hozan, lê nolî rêzanekî tê naskirin û dîtin. Ez bi xwe, ji bilî dengbêjên cihî (mihelî), bi stran û klamên wî jî, li nasnameya xwe ya neteweyî werqilîm. Li ser min bandora wan stranên heye.

Ew gava ku min cara pêşîn li "Kî ne em" guhdarî kiribû, hîna jî di bîra min de ye. Lê ew dema ku min li strana "Xanê" guhdarî kiribû? Tevzînek hatibû min, mûyên canê min bûbûn mîna şûjînan. Di wê stranê de Şivan mizgîniyek jî dida gelê kurd û digot: "... Partiya Karkeran rabû."

Çi bû, çi qewimî, ew li aliyekî, lê gel her li hîs û pêjna Şivan digeriya. Bi avabûna televîzyona Medê ev yek eşkeretir derkete holê. Gel, ji rayedarên televîzyonê derxistina Şivan dixwest. Rayedaran jî, dadixuyandin ku ew jî dixwazin wî derxin.

Şivan Perwer, bi vî awayî kete rojeva kurdan. Gel, tev meraq dike ka Şivan çi dixwaze, çi dibêje. Aha ji ber van yekan, me jî bi Şivan Perwer re hevpeyvînek pêk anî û em di vê hejmarê de diweşînin.

Ev e hûn û ev e Şivan. Daxwaza me jî, ew e ku kurd li hev aş (t) bin, ji hev re bira bin, ji bo yekîtiyê û felata vî gelî di milê hev de, li kar bin. Divê cudatîyên me yên ji her curehî nebin asteng li ber yekbûna me. Her wiha gere kêmasî jî zêde neyêne mezinkirin.

Li Ewrûpayê MÎT û MHP

Dewleta tirk li Kurdistanê û Tirkîyeyê her çend derbeyan dixwe û tenseszar dibe, wisa dîn û har dibe. Jixwe ev karakterê faşîzmê ye. Her berê jî dikir, lê niha bêhtir tenseszar bûye û faşîzma xwe jî, li Ewrûpayê, bi taybetî li aliyê Almaniyayê tûjtir kiriye. Karê xwe jî, bi destên MÎT, MHP, Daîreye Cenga Taybet û bi fikir û îdeolojiya Tirk-Îslamê dikin. Dewleta tirk xortên serserî, tolaz û eroînman, bi pereyan dikire û diajo ser welatparêzên kurd. Berî çend rojan Navenda Çandê ya Kurdî, li Limasola Kibrisê hate bombekirin, sala çûyî dîsa bi navê Seyfeddin Kalan xortekî welatparêz li Nûmünstera Almaniyayê şehîd kirin û hinek hevalên wî jî, birindar kirin. Berê jî, li Danîmarkayê İmdat Yılmaz, li Swîsreyê (İsviçreyê) Şemsettin Kurt şehîd kiribûn. Ne bi tenê mirovên kurd, însanên ku dostaniyê bi kurdan re dikin jî tene qetilkirin; wekî Teofilos. Ev ne tişteki ecêb e û seyr e. Ji ber ku jiyana faşîzmê li ser xwînrijînê ye. Kî doza mirovahiyê bike, ew dibe dijminê faşîzmê.

Hevalbendên faşîzmê, li derve jî hene û ew jî kurdan û hevalbendên wan digirin, dikujin. Polisên alman jî xortekî kurd bi navê Halim Dener li Hanofere kuştin, Gülnaz Baqustanî li bajarê Berlîne şehîd ket. Di vê qetlîama dawiyê de baş eşkere bû ku, dewleta alman çavên xwe ji faşîstên tirk re dişkine û

Hevalbendên faşîzmê, li derve jî hene û ew jî kurdan û hevalbendên wan digirin, dikujin. Polisên alman jî xortekî kurd bi navê Halim Dener li Hanofere kuştin, Gülnaz Baqustanî li bajarê Berlîne şehîd ket.

AHMET XALIT

hevalbendiya wan dike. Ev jî, ji me re ne gelekî xerîb û ecêb e. Mantiqê kapitalîzmê ya navneteweyî ye ev. Ji bo parastina berjewendên xwe, di dawiyê de dest bi karê faşîstî dikin û arîkariya hev û din dikin.

Armanca dewleta tirk û hevalbendên wê bi van êrîşên faşîstî, ku li ser gelê me bi pêk tînin, em karin bi kurta-yî wisa bînin zimên:

1) Ji bo ku şovenîzm û nijadperestiyê di nav tirkan de xurt bikin û gelên tirk û kurd bikin dijminê hev û bi hev bidin kuştin. Em dikarin bibêjin di vî warî de hinekî gihîştine armanca xwe. Xuya ye ku di vî warî de, gunehkarê mezin ne dewleta faşîst e. Ji ber ku her kuştin û xerabî karê wê ye, lê yên ku bi navê karê însanî, şoreşgerî û demokratîk û rewşenbîriyê rabûne, gunehê wan mezin e. Pêwîst e nesekinin, bi karê xwe rabin.

2) Dixwazin tirsê tîxin dilê gel û

welatparêzan. Li Kurdistanê çi nemirovatiya wan hebû, bi kar anîn; lê gelê Kurdistanê teslîm nebû. Belê hinek tirs peyda kirin. Gel, ji mecbûrî hatin metropolan û Ewrûpayê. Lê gel û welatperêz, li van cihan nesekinin û teslîmiyet qebûl nekirin. Belê dewleta faşîst dixwaze karê xwe yê faşîstî li van cihan jî pêk bîne û pêk tîne jî. Ji ber ku ew jî yekîtiya gel ditirse, dizane ku li ku yekîti hebe, ji wan re xerab e.

3) Dîsa dixwazin bi van êrîşên xwe yên provokatîf, gelê me terorîst û xerabkar bi cihanê bide naskirin.

Armanca esasî ya dewleta tirk û hevalbendên wê, mirov dikare bibêje ev in. Belkî heta niha di van êrîşên xwe de, hinekî bi ser ketibin, lê belê ji niha û pê ve ne mumkun e ku bi ser bikevin. Lewre gelê Kurdistanê bi piranî rîya rizgariya xwe nas kiriye. Êdî nema teslîmiyetê û xiyaretê qebûl bike. Dema tirsê jî derbas bûye. Neyar nema dikare bi dek û xapînokan gelê me ji rêka wî derxe. Ew çiqas karê faşîstî û nemirovatî dike, dîsa gel nayê xapên wan, he ta gelê tirk jî, hişê xwe dide serê xwe. Mesela Jina Albayê ku li Mêrdînê di şerê kirêt de hatibû kuştin, Tomris Özden, bi xwişka gerîlayekî ku şehîd bûbû ve, dest dane hev din û li dijî şerê dewleta faşîst derketin. Ev numûneyeke bi rûmet e. Ev numûneyeke biratiya gelan a rastîn e. Dîsa dilên di dest PKK'ê de û malbatên wan de jî daxwaza aştîyê û biratiya gelan tînin zimên.

'Bila tirk ber bi aştîyê ve were'

"Dibêjin însanekî ku bindest be îbadeta wî qebûl nabe. Ew însanê ku bi zilmê razî be, îbadeta wî qebûl nabe. Yanê em dixwazin ku îbadeta me qebûl bibe. Min nedixwest ku ev bûyer di mala min de çêbibe, min nedixwest ku di mala tu mirovî de çêbibe. Lê îro ev tişt çêbûye. Ez bixwazim jî, nexwazim jî çêbûye. Tişteke di destê min de nîn e. Lê ez dixwazim însan li ser bisekinin û vê meseleyê çareser bikin."

Di 30'yê rêbendanê de (30.01.1996), li nava Nisêbînê polis bi roj girtin ser malekê, bi hinceta ku yekî gerîla ketiye hundirê wê malê. Di encama lihevixistinê de, sê polis (yek jê Mudurê Emniyeta Nisêbînê) tên kuştin, polîsek birindar dibe; ew jî li nexweşxaneyê dimire. Ji aliyê din ve zîlamê di malê de tê kuştin û keç û zavayê malê jî tene birindarkirin û pişt re ew jî li nexweşxaneyê dimirin.

Leşker û polis jina xwediye malê Mehmet Aslan (Ayşe Aslan) û qîza wî Muhabet Aslan digirin bi xwe re dibin. Mehmet Aslan demeke dirêj digel hemû hewl û serîlêdanan, tu saloxî der barê wan û rewşa wan de bi dest naxe.

Piştî du heftiyan, hêzên dewletê roja 13.02.1996'an Ayşe Aslan (50) û Muhabet Aslan (13) derxistin dadgehê

û ew şandin Girtîgeha Mêrdînê.

Mehmet Aslan sê-çar sal e ku li Stenbolê dimîne. Di avakirina xaniyan de dixebite, gava ku bûyer di mala wî de diqewime jî, ew dîsa ne li malê, li Stenbolê ye. Der barê bûyerê de me pê re hevpeyvînek pêk anî.

Hûn dikarin xwe bi me bidin nasîn?

-Navê min Mehmet Aslan e. Ez li gundekî ku bi navçeya Nisêbînê ve girêdayî ye rûdiniştim. Wexta ku emrê min ji 12'yan kete 13'yan, min rahişte şûrikê halet. Heta ez ketime 25'an min cot kir. Min genim diçand, min paleya genim dikir. Piştî wê ez ji gund derketim; çûm Batmanê. Demekê li wir min karê elektrîkê kir. Careke din jî ez vergeriyam Nisêbînê. Ev sê-çar sal in jî ez hatime vê derê (Stenbolê). Li vir jî ez di avakirina xaniyan de dixebitim. Ca-



Ayşe Aslan

riyan di avahiya de radizem, carinan jî diçim mêvaniya dostan.

Ev bûyer kengî û çawa çêbû?

-Bûyer di roja 30'yê rêbendanê de, saet li dora 16.10'an çêbûye; yanê berî êvarê çêbûye. Ji dûv re dane pey wî însanê ku ketiye hundirê mala min. Polîsan jî êrîşî ser mala min kirine. Di vir de şer derketiye û ew kesê ku hatiye xwe avêtiye mala min, hatiye kuştin. Piştî ev kes tê kuştin, zavayê min Aslan Koçer, li ber derî lêxistinê birindar kirine û bi birindarfî girtine binçav. Qîza min Zayide Aslan jî bi zavayê min re girtine binçav. Qîza min û zavayên min saet 24.00'ê şevê, mirî tînin Nexweşxaneyê Dewletê ya Nisêbînê. Piştî şer ketine malê, bermaliya min Ayşe Aslan (50), qîza min Muhabet Aslan (13) û kurê min î biçûk Abdullah Aslan (5), Îrfan Aslan jî girtine binçav.

Piştî we bûyer bihîst, we çî'kir?

-Çar pênc rojan ez ji zarokên xwe bêguman mam. Yanê zarokên min windayî man. Ez telefonan dikim, tu agahî ji wan hilnadim. Piştî wê gotinê yek, bi diya xwe û bi xweha xwe ya mayî re di destên wan de bû, birin. Ew jî kurê min Îrfan bûye. Ew jî muxtarekî di pey re gotê ku ew danîne maleke yediemîn. Pey re jî birine mala muxtarê mihelê, ji vir jî birine emniyetê. Piştî re jî xalê wî çûye ew ji emniyetê aniye malê. Min her roj telefon vedikir ji bo kurê xweyê mezin Îrfan. Xalê wî got ew jî ber-



Muhabet Aslan

dane, hatiye malê. Di gelek gotinên pêşiyar de, dibêjin, "dost dost e, muamela durist e". Heke di dinyayê de xelkek heye, ne tenê xelkê kurd, temami xelkê bindest ê di dinyayê de tişteke heye, bila lê bipirsin. Dibêjin însanekî ku bindest be îbadeta wî qebûl nabe. Ew însanê ku bi zilmê razî be, îbadeta wî qebûl nabe. Yanê em dixwazin ku îbadeta me qebûl bibe. Min nedixwest ku ev bûyer di mala min de çêbibe, min nedixwest ku di mala tu mirovî de çêbibe. Lê îro ev tişt çêbûye. Ez bixwazim jî, nexwazim jî çêbûye. Tişteke di destê min de nîn e. Lê ez dixwazim însan li ser bisekinin û vê meseleyê çareser bikin.

Wexta ku te ev bûyer bihîst wê çaxê çî kete dilê te?

-Tiştê ku hate dilê min, gotinê yek kes ji wan nemaye. Min telefonî çiranan kir. Gotin ku mal di bin ablûqayê de ye, em tişteke nizanin. Lê gotin bermaliya te û zarokên te bi xwe re birin. Sebreke min hey, ez qet bi ber neketim. Wekî ku ne di mala min de çêbûbe. Qet germî di dilê min de çênebû. Piştî wî emrî xwîna min cemidiye, wê çawa dilgermî bi min re çêbibe.

Tiştêke bi mala te kiribûn?

-Ez li vê derê dişixulim. Qûtê çend salan li mal datînim. Nava hundir jî berberika hatiye xirakirin, lê derveyî hundir tişteke pê nebûye. Di hundir de qûta me tevî hev kirine, nayê xwarin.

XEYRÎ POLAT



HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

- * Kovara Helwest, kovara fêrbûna edebî ye...
 - * Kovara Helwest, pêngava munaqêşe û rexneyên edebî ye...
 - * Kovara Helwest, helwesta ilmî-zanistî ya çandî û edebî ye...
 - * Kovara Helwest, pêngavek e ji pêşveçûna çand û edebiyata kurdî re...
 - * Kovara Helwest, bixwînin, bibin abone...
- Hejmara 3'yemîn derket!**
Navnîşana xwestinê: Tensta Alle 43-2tr 16364
Sanga / Sweden

Du şehîdên ji çapemeniya kurd


Cengiz Altun / Kemal Kılıç

Du can, du rojnamevan, ji bo ronîkirin û agahdarkirina gel serê xwe danîn. Bi gotina rast, hatin kuştin. Hêlek dibêjin ku kujyarên wan ne diyar in; lê ya din rind dizane ku kê ji bo çî û ji ber çî ew kuştin.

Cengiz Altun ji bajarê Batmanê, ji navçeya Kerceswa (Gercüş) ji gundê Hêsarê ye. Di sala 1968'an de ji dayika xwe bû. Di rojnemaya Yeni Ülkeyê de dest bi rojnamevaniyê kir, lêkolînên wî li ser Hîzbulah û kontr-gerîla di rojnameya Yeni Ülkeyê de hatibûn weşandin. Altun jî wekî her rojnemavani, wezîfeya xwe dianî cih û kirinên dewletê yên li ser kurdan derdixiste ronahiyê. Ji lew re, gelek caran hatibû tehdîtkirin. Kujyarên Cengiz hê jî nehatine girtin. İsmail Emsen, bi çeka ku pê Cengiz hatiye kuştin, li Amedê hatibû girtin. Ev zîlam di mehkemeya dawîn de hate bereatkirin. Sedem jî wiha hatiye nîşandan: Li gorî agahiya çavdêran, mirovê ku Cengiz kuştîye 17 salî bûye û bi destê xwe yê çepê demançe bi kar aniyê.

Li hêla din İsmail Emsen gotiye ku ev demançe ji birayê xwe Metin Emsen ji bo xweparêziyê, bi emanetî standiye. Çi xerîb e ku, ji çavdêrên kuştina Cengiz Faris Orhan jî hatiye kuştin. Yanê ev tişt jî nîşan didin ku dewlet ji bo rastî dernekeve holê, çî ji destên wê tê, dike.

Kemal Kılıç, sala 1993'yan di 24'ê reşemiyê de li Ruhayê hate qetilkirin. Kemal Kılıç di rojnameya Özgür Gündemê de nûçevanî dikir. Kılıç berî ku bihata



Cengiz Altun



Kemal Kılıç

kuştin ji aliyê kontra ve hatibû tehdîtkirin. Wî jî, ji dewletê ji bo ewletiya xwe, belavkarên rojnameyê û bayiyên ku rojnameya Özgür Gündem difrotin, serî li Walîtiya Ruhayê xistibû.

Waliyê Ruhayê wê demê Zeynettin Akbulut bi hinceta ku heta wê demê tiştêkî bi belavkar û rojnemavanan nehatibû, qebûl nekiribû. Ev serîlêdan di 3'yê rêbendana sala 1993'an de hatibû kirin. Piştî se-

rîlêdanê, di 5'ê rêbendanê de buroya Özgür Gündemê hatibû bombekirin. Kemal Kılıç bi daxuyaniyekê bûyer lanet kiribû û bangî walî û Mudurê Emniyetê kiribû ku wezîfeyên xwe bînine cih.

Pişt re di 24'ê reşemiyê 1993'yan de li Ruhayê hate qetilkirin. Qatîlên wî hê jî nehatiye dîtin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Pîvan û wezin

MEDENÎ FERHO



Mafê dadî heye. Ev maf çiqasî bête bikanînin ew qasî delal û hêja ye, pîroz e. Mînak: Adres, rewşenbîrên kurd in. Rewşenbîrên kurd mafên dadî xilmet nakin. Nekirine! Ev hêz di xwe de nedîtine. Em bibêjin heya îro di xwe de nedîtine. Yan jî, heya îro bi kar neanîne. Vekirî ye! Darî çavan e!.. Nexwe xistiye nava cendera malxwêtiyê, ne kesekî din. Diyar e ku ew kesê nikaribe xwe têxe nava cendera malxwêtiyê, nikare bendekî din têxe nava cenderan. Maf namîne.

Pîroziya mafê dadî, ji vir tê. Pêşî xwe, pişt re hevalên xwe. Îro, belê îro cotkariya nîrekî din derketiye pêşîya me. Nîr zêrîn dibe, qehî dimîne, di pêşerojan de wê kifş bibe. Destpêk e! Misrîtiya guftûgoyê, ji vir tê. Çend roj in rewşenbîran, ew rakiha ku tê de pelax bûbûn û di nava bédengiya nebûnê de windayîbûn, derketine. Dengê xwe dikin. Ji nişkê ve be jî, bédilê wan be jî, deng derdikeve. Êdî, pêwistiyek heye li meydane. Awazeke bi rêkûpêk derneketibe

jî, rê û şivile neyên diyarkirin jî, dilşahiyeke e! Bextiyariyeke ku ba lebitî, hin bi hin dişidihe û ewran li hev û din kom dike. Ku ewr li hev û din civiyan, her wê tiştêkî xêrê xuya bike. Hêvî ew e ku ne teyroka malkambax be!..

Nivîskar tev, dabaşa doh tînine ziman. Malxwêtiya derve ye!.. Xem tune ye!.. Dûr-dûr dest pê bike û li doha xwe bizivire jî, hin bi hin wê xelek teng bibe û bête ser navendê... Ku ling kete ser kevirê navendê, guftûgo wê bêhtir bê ser pirsgerêkan û çareseriyê. Mijar yek bi yek wê bêne ziman û bingeha xwe bibînin. Lê, şaşitiyek heye. Mixabin, berî her kesî Günay Aslan kete nava vê şaşitiyê. 12 'yê reşemiyê, di nivîsara xwe ya Özgür Politika de gotin wilo anî ser rewşenbîrên kurd yên ku li Ewrûpayê ne. Dêhnê xwe didime nivîskarên din jî, gotin dizivire tê, vê şaşitiya wezin û pîvanan diyar dike. Lewre galegal cihê xwe nabîne... Bi rastî şaşitiyeke mezin e.. Dilê min qabil nade da ez qebûl bikim. Kevirê mîhengê welat e!. Gerek e pîvan û wezin li ser vê rastiyê bingeh bigire.. Ku ne wilo be, armanc şaş diyar dibe. Berê rê û şivîlan dikeve hêla reş û tariyê. Yan jî, divê ku du benda bên kifşkirin. Ez bi xwe, van her du

bendan bi xişkên reş û qalind dinivîsim. Yek: Rewşenbîrên li welat!.. Du: Rewşenbîrên li derveyî welat. Çiqasî, sazî û dezgehên neteweyî, bi piranî li derveyî welat bin jî, nayê wê maneyê ku rewşenbîrên her du hêlan, di nava yek hawînê de ne û encama wan di yek pîvan û wezinê de ye...

Yek: Rewşenbîrên li Ewrûpayê hindik in. Ji rastiya rewşa welat agahdar bin jî, şert û şurûtên jiyana û xwezayî bandorê li ser hebûn û jiyana wan, li ser hewana û ramanên wan dikin. Pir kesên hêja bêsîlûk û bédeng kirine. Bêsîlûkî û bédengî birayê hev û din in, xelasî ye. Du: Rewşenbîrên li welat pir in û ji sedî sed ji rewşa welat agahdar in, bivên nevên di nava tevgera civakî de ne. Berdêlê didin.... Ji kîjan dîtina polîtîk bin, ferq nake.. Her berdêlek heye!.. Biçûk, mezin, êrîşên dijmin li ser xwe dibînin. Berxwedan û tekoşîna wan çawa be jî, ji ya komicîka Ewrûpayê bi hêztir e.... Dema ku em di girtîgehê de bûn, şiyar ev bû: "Em girtîbin jî, li hemberî çavên dijmin in.." Bi rastî pîvan û wezin gerek e ev be.... Ji bo ku bingehê qewîn derkeve û rê û rêçik jî, xweşik û delal derbikevin meydane...

Kurtegerînek li Êrisêtê

der barê kurdan de

Kurdên Sovyetê, ji bilî çalakîyên edebî û çandî, dest bi çêkirina filman jî kirin. Filma "Hevrûkirina Rîşarê Dilşêr bi Selahedînê Eyûbî re" ya wan a yekemîn e. Ev film edalet, şervanî û oldariya Selahedînê Eyûbî û edalet û wêrekiya Rîşar dida ber hev. Dû re wan filma "Mem û Zîn", "Siyabendê Siwarî", "Xanî Dimdim" jî, li ser perdeyên spî bi gelê kurdan temaşekirin.

Yekîtiya Sovyetan, ji salên 1926'an bigire ta 1950'î tu dijwarî derne-xistibû ber hînbûna ziman, çand û hûnera kurdî. Hem alîkariyên akademîk dan kurdan û hem jî dibistanên bi kurdî dane avakirin. Kurdên Sovyetê jî, ji van mafan îstifade kirine û tesîra wan li ser her çar parçeyên Kurdistanê jî çêbûye. Heta ku Komara Kurdistanê ya Mehabadê ava bû, ev çalakîyên kulturî hem ji Komara Sovyetê alîkarî didît, hem jî kurdên Sovyetê dixwestin tesîra ziman, çand û hunera kurdî li ser tevahiya kurdan bikin. Piştî hilşandina Komara Mehabadê, ji aliyê Îranê ve, Îranê jî Sovyetê xwest ku kurdan ji hin mafan bêpar bike. Komara Sovyetê jî, li ser vê daxwazîyê hin mafan bi şûn de standin û alfabe ya latînî bi alfabe ya kirilî guhertin.

Li gorî îstatîstîkan, li Sovyetê di salên 1900'î de 120 hezar kurd dijîyan û piraniya wan li Laçîn, Yerîvanê, Kafkasyayê û Tirkmenîstanê bûn. Tevî hejmarê wan hindik bû jî, tu asimilasyon li ser wan nehate meşandin.

Di sala 1926'an de, hin kurdên rewşenbîr serî li Komara Sovyetê xistin. Wan dixwest mafên ku ji bo azerîyên wê derê hatine dayîn, bidine wan jî. Ev daxwaza wan ji aliyê rêveberîyê ve hate qebûl kirin û profesorek (Prof. Maragulav) jî wezîfedar kirin ku alfabe yeke bi tîpên latînî ji kurdan re hazir bike. Ev alfabe, di sala 1929'an de hazir bû, di sala 1934'an de jî, di Konferansa Kurdolojiyê de hate qebûl kirin.


Li 1929'an, bi çêbûna alfabayê re,

rojnameyeke bi kurdî, bi navê Riya Teze dest bi weşanê kir. Riya Teze, di warê çandî, hunerî, civakî de wekî rojnameyeke hefteyî dihate weşandin. Her wiha nivîsên edebî, nivîsên li ser folklorê kurdî, kevneşopî û pir-rengîyên kurdî di nav rojnameyê de, cih ji xwe re diditin. Ev rojname hê jî weşana xwe didomîne, lê bi tîpên kirilî derdikeve.

Dibistanên ku bi zimanê kurdî perwerdehiya ziman û kultura kurdî dikirin, hatine avakirin. Ji sala 1933'yan ta sala 1940'î, 2 hezar zarokî dibistan qedandin, hê jî ev dibistan hene û bi alfabe ya kirilî perwerdehiyê didin. Ev dibistan bûne bingeha lêkolînên akademîk ji çand, huner û zimanê kurdî re, da ku di zanistgehên Sovyetê; di Unîversîteya Lenîngrad, Tiflis, Moskova û ya Azerbeycanê de şaxên filolojî, sosyolojî, lêkolînên edebî, edebiyata gelêrî, dîrok û hwd. ava bûn.

Piştî dibistan û rojnameyê, kovareke 664 rûpel bi navê "Folklorê Kurmancî" jî dest bi weşanê kir. Naveroka kovarê bi temamî çand, huner, kevneşopî û pir-rengîya kurdan bû. Nivîsên bi rengê lêkolînên dîrokî, lêkolînên edebî, edebiyata gelêrî dihatin weşandin.

Kurdên Sovyetê bi van çalakîyan jî neman, dest bi çêkirina filman kirin. Filma "Hevrûkirina Rîşarê Dilşêr bi Selahedînê Eyûbî re" ya wan a yekemîn e. Ev film edalet, şervanî û oldariya Selahedînê Eyûbî û edalet û wêrekiya Rîşar dida ber hev. Dû re wan filma "Mem û Zîn"; "Siyabendê Siwarî", "Xanî Dimdim" jî li ser perdeyên spî bi gelê kurdan temaşekirin.



Romannivîsê kurd ê navdar Ereb Şemo, ne bi tenê li nav kurdên Sovyeta berê, her wiha di nav hemû kurdan de tê naskirin.

Bi van pêşketinên civakî re, nivîskarên kurd ên ciwan dest bi nivîsîna romanên kirin. Ereb Şamilov (Şemo) romanek nivîsand bi navê "Şivanê Kurd"; jiyana şivanekî kurd ku tevî şerê azadiya şoreşa Sovyetê bûye li ser rûpelan raxist û gihand xwendevanên kurd. Ev roman li sê zimanan hate wergerandin: Fransîzî, Rûsî û Gurcî. Her wiha romanên bi navê Berbang, Dimdim û jiyana Bextewar jî berhemên Eber Şamilov in.

Bikaranîna zimanê kurdî, ku li serê qedexeyê tune bû, her diçû zêde dibû. Li Kafkasyayê jî kovareke bi navê kovara "Qafqas", ji 32 rûpelan pêkhatî, li Tiflîsê hate weşandin. Di kovarê de, ji meseleyên civakî heta bi sedemên lipaşmayîna gelên bindest û di warên siyasî de jî, ji bo pêşketina wan tiştên pêwîst cih digirtin. Di vê navberê de Radyoya

Dengê Yerîvanê jî dest bi weşanê xwe kiribû, her roj saet di 15'yan de dest bi weşana bi kurdî dikir. Weşan saetek bû pişt re kirin saet û nîvek. Li Tiflîsê jî radyoyeke nû ava bû. Vê radyoyê jî saet di 17'an de weşan dikir. Ev radyo li bakurê Kurdistanê, Îran û Îraqê bî hêsanî dihate guhdarîkirin. Radyo, bi folklorê kurdî, stranên gelêrî, nûçeyên li ser kurdan û çalakîyên kurdên Sovyetê, bi danasîna stranbêj û dengbêjên kurd weşanên xwe diqedandin.

Di sala 1933'yan de, ji aliyê ermenî û kurdan ve ferhengek bi navê "Xebemama ji zimanê fileyî-kurmançî" hate çêkirin. Ev ferheng Kurdî-Ermenî, Kurdî-Rûsî, Rûsî û Kurdî ji 14 hezar peyvên pêk dihat. Di sala 1957'an de ferhengeke bi navê "Qan Tara Kurdî" jî hate weşandin. Ev ferheng jî, bi Kurdî-Rûsî ji 14 hezar, Kurdî-Ermenî ji 34 hezar, Ermenî-Kurdî jî, ji 30 hezar peyvî pêk hatîye.

ՐԻԱ ԴՅՅԹ

ОРГАНА ШЕВР: РЕСПУБЛИКА
ЕРМЕНИСТАНЕ՝ ԳՄՐՔԵԼԻՆԸ
Վ ՄԵՄՐԱ ԵՅՆՐԱ

ՊՅՅՆ ԲԵՆԵՆ ՕՐՔԵԼ ԴԵՄՈՍԿԵԼԻ
ՇՐՔԵՆԵՐԵՆԸ ԿԵՐԿՈՐՈՒՄ
ԵՐԿԵԼԻ ԵՎ ԿԵՐԿԵՐԵԼԻՆԸ ԵՐԿԵԼԻ

ՐԻԱ ԴՅՅՐՔ՝ ՕՐԿԱՆ ԵՐԿՐՈՒՄՈՎՈՅ
ՏՈՎԵՏԱ Ե ՏՈՎԵՏԱ ՆԱԽԱՐԱՐՈՎ
ՐԵՍՔՍԵԼԻՔԻ ԱՐՄԵՆԻԱ


№ 2 (4543)
ԿՐԻՄՈՄ
23-с
ՕՔՏԱՔՐԵ
(ԿՐԻՄ ՄԵՇԻՅԵ
ՏԱՂԱ 1991
ՓԿՁՆ 15 ԿԱՅԵ

ЖЪ САДА 1930-И ИШЪРДԵԵՑ ԵՎ ԵՐԵՒԵ ԴՈ ՇԱՐԱ ԴՅՐԵԻ

Logoya Riya Teze

Çavkanî
Lucian Rambout
Çağdaş Kürtdistan Tarîhî
William Aegleton
Mehabad Kürt Cumhuriyet

METİN AKSOY



● 21 reşemî 1991

Şairê kurdî bi nav û deng Hejar di 21'ê reşemîya 1991'an de li bajarê Kerecê wefat kir. Hejar di sala 1921'an de li Kurdistana Îranê, li bajarê Mehabadê hatiye dinyayê. Wê wî yê rastîn "Ebdurrahman Şerefkendî" ye.

Piştî avabûna Komara Kurdistanê ya Mehabadê çî bi şîr û helbestên xwe ve di nav gel de baş hate nasîn. Hin ji berhemên wî ev in: Alekol (helbest), Xeyam (helbest), Hejar Bo Kurdistan (helbest), Mem û Zîna Ehmêdê Xanî cara pêşîn wî wergerandiye kurdiya murkî-soranî û çap kiriye.

● 21 reşemî

21'ê reşemiyê roja têkoşîna li dijî mêtîngêkariyê. Dagirkerî, talankirin ji demeke dirêj ve hebûn. Li ser navê Xwedê an jî belavkirina şarîstaniyê li nav qewmên hov, hin der dihatin vegirtin. Bi rûdana kapîtalîzma nav guherî bû kolonyalîzm anglo mêtîngêkarî. Lê pir neçû, li hemberî wê şerê, serxwebûna neteweyî rû da. Di sed sala 18'yan de gelê Amerîkayê li dijî Îngilîzan bi ser ketin. Ew cure şer, di sedsala 19 û 20'an de der gu bû û nîveke sedsala 20'an li gelek deran gîha encamê. Lê hê jî li ser rûyê dinyayê gelên bîndest wekî kurd, filîstîn, tamîl û hwd. şerê mafên neteweyî dikin.

AWIR

Rojnameya ku li ser rehên Hawarê şîr bû:

WELAT

Rojnameya Welat, ji bonî serfiraziya zimanê kurdî gaveke pir mezin e, em dizanin Rojnameya Welat, di vê navçê de gaveke dereng e. Lê belê gaveke xurt û dîrokî ye. Rojnameya Welat:

- Ji bonî şahiya destbiraka ye
- Ji bonî bîranîna bav û kala ye
- Ji bonî dilxweşiya dayîka ye
- Ji bonî bîranîna Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmêdê Xanî yên wekî wa ye. Silavê li ser egîr û şehîda ye, welat hêviya we ye, ji welatê xwe re xwedî derkevin."

Xwediyê Rojnameya Welat Zübeyir Aydar, di hejmara yekemîn a Welat de, bi vî awayî maneya rojnameyê anîbû zimên. Musa Anter jî, di eynî hejmarê de li ser derketina wê wiha gotibû:

"Çima em derdikevin? Adet e, wextê ku rojnameyek derdikeve dibêjin "Çima em derdikevin?" İca ji bo Welat, gerek em bêjin çima emê dernekevin? (...) Xelkê em kerr û lal kirine. Em nema ji zimanê hev fêhm dikin. Ji bo em hîn zimanê xwe û hev bibin em derdikevin.. İnsan ku ji hev hîn nebe, li hev nayê, li hev nabane. Em ji bo baneya hev derdikevin.

Ji bo xelasi û serbilindiya temamê Tirkiyê û xelkê Tirkiyê û ji bo biratiya tirk û kurdan em derdikevin."

Rojnameya Welat di 22'ê sibata 1992'an de bi hejmara 1'emîn silav da gelê xwe û di 21'ê gulana 1994'an de jî, bi hejmara xwe ya dawîn (115) jî, xatir xwest ji xwendevanên xwe.

Xwediyê Rojnameya Welat Zübeyir Aydar, Gerîndeyê Giştî Abdullah Keskin, Berpirsiyare Karê Nivîsaran Mazhar Günbat bû. Ji aliyê kadroya nivîsaran ve jî Welat gelek dewlemend bû. Kesên mîna: Musa Anter, İsmail Beşikçi, Hatip Dicle, Leyla Zana, Adburrahman Durre, Hüseyin Deniz, İsmail Gölbaş, Yaşar Kaya, Amed Tigrîs, Feqe Hüseyin Sağnıç, Dilbixwîn û hwd. dêhna mirov dikişandin ser xwe.

Di Rojnameya Welat de her çiqas giranî li ser zaravayê kurmançî be jî, bi zaravayên dimilî û soranî jî nivîs dihatin weşandin. Li ser mijarên cihê cihê mirov nivîsan tê de dibîne; ji nûçeyan bigire heta çand û hunerê, ji mîzahê heta nivîsên ji bo zarokan û ji siyasetê heta magazînê.

Welat li ser bîngeha Rojnameya Hawarê, ku di sala 1932'an de ji aliyê Celadet Bedirxan û hevalên wî ve hatibû derxistin, derket. Ji al-



Ji bo jiyanê ne nuh

Welat ji bo jiyanê ne nuh... (Introductory text for the article)



Vebirrin ji ne çare ye

Vebirrin ji ne çare ye... (Text of the article)

Gund di bin aşitê de ne

Gund di bin aşitê de ne... (Text of the article)

ROJNEYA WELAT

Piştî 70 sal... (Text of the article)

Hejmara yekemîn a Rojnameya Welat

fabeyê heta gramer û rastnivîsa rojnameyê jî, li ser eynî bîngehê ava bûbû. Rojnameya Welat li Stenbolê derdiket, lê tevî zehmetiyên belavkirinê, wê xwe digihand her çar parçeyên Kurdistanê jî. Ji logoya rojnameyê jî xuya ye ku ew, dengê bakurê Kurdistanê bû. Lê ew, ne tenê li Bakur, li parçeyên din jî dihatê belavkirin û bûbû dengê parçeyên din jî.

Min dixwest ku di vê nivîsê de tiştên din jî bibêjim, lê ne mumkûn e ku rûpel têrê bikin. Tiştên gotinê zehf in, lewre hê amadehiya rojnameyê wisa dihat kirin ez tevî xebata rojnameyê bûbûm. Piştî haziriyê, rojname dest pê kir, ji du salî zêdetir jiya û dû re xatir ji xwendevanên xwe xwest. Bi kurtayî mirov dikare wê bibêje; çî dibe bila bibe, di şert û rewşa kurdan a wê demê de gaveke wisa, mezin û xurt bû.

Welat, li bakurê Kurdistanê bû çavkaniyê mezin ji bo xwendin û nivîsandinê. Bi saya wê bi hezaran xwendevanên zimanê kurdî çêbûn. Mixabin ji ber hin pîrsgirêkên resmî û aborî temenê rojnameyê zêde dirêj nebû, lê piştî wê, rojnameyên ku bi temamî bi zimanê kurdî derketin ji wê kelk (feyde) standin. Gerek e îro jî di warê çapemeniyê de li ser vî bîngehê, bi awayekî xurtir û geştir xebat bê kirin.

AYNUR BOZKURT

ÇAVDÊRÎ

DILBIXWÎN DARA



Niha jî em hev mehkeme dikin

Eger ku tu ji min hez bikî, wê demê ezê jî te hez bikim. Eger tu ji min nefret bikî, ezê jî te nefret bikim. Eger ku tu min bikişî, ezê jî, bibim dijminê te yê herî mezin. Eger ku tu pênuşa xwe li dijî min tûj bikî, ezê jî bédeng nemînim.

Çî hatiye serê me! Werin em bédeng nemînin. Werin em li dijî hev binivîsînin, werin em sînga xwe ji hev re vekin. Lê ji bîr nekin ku li ser sînga me gul hene, çiçek xemilîne, di pêşerojê de, wê ew bibine gulistanek. Dîsa jî, em xwe veneşêrin, heya dawiyê ji hev re vekirî bin û ji hev re bi erzanî bazara aqilan nekin. Car caran em behsa edebiyatê dikin, car caran em behsa romanê û gelek caran jî em behsa rewşenbîriyê dikin. Li dawiyê jî em di meydandê de, mehkemeyeke wiha mezin û bilind dibînin û rewşenbîr, rewşenbîran mehkeme dikin.

Di vê mehkemeyê de, rewşenbîr hem tawanbar e, hem dozger e, hem jî xwediyê daweyê ye. Carekê me jî şaşî kir û me di rojnameyê de çend tişt gotin. Wekî her kesî dilê me jî xwest em pênuşê ji bêrika xwe derxin û xwendevanên li ser hinek bûyeran xeberdar bikin. Belkî pozê pênuşa me tûj bû, lê belê dilê wê ji bo welat ji gelek dilan germtir bû, çavên wê jî, ji gelek çavan bêhtir vekirî bûn. Ezê çî bikim, her demê li gorî dilê her kesî gotin ji devê qelema min dernakevin, lê belê tu caran jî, min destûr nedaye qelema xwe ku, çavan ji kêmasiyan re bigire û ji her tiştî re bibêje, "tewlo!"

Rast e, me got çavên me romanivîsan nabînin, me got romanî kurdî hîna nehatiye nivîsandin, me got rewşenbîrên ku ji xwe bêhtir li welat bifikirin, gelekî hindik in. Lê belê tu caran me negot ji nava kurdan Musa Anter derneketine. Vê jî divê em ji bîr nekin ku li dawiyê Musa Anter bû şehîdekî serxwebûnê. Tu caran em nikarin xwe di piştî Apê Mûsa de veşêrin. Rastiyek heye, werin em wê jî ji hev re bibêjin, em rewşenbîrên kurd, ji rexneyan ditirsin. Xwe nêzikî rexnegirtinê nakin. Ji rexneyan bêhtir, gotina "baş e" li xweşiya me tê. Em hîn bûne ku ji her tiştî re bibêjin baş e, ev jî nexweşiyek e.

Gelo, hûn dikarin bibêjin ku, rewşenbîran, nivîsaran xwe gihandine hev û bi hev re kovarek, rojnameyek weşandine? Tune ne. Û li dawiyê em li rojnameyê, hev mehkeme dikin. Baş e ku ev rojnameyê kurdan e. Mixabin, hîna jî, kesek nizane wê dawiya vê mehkemeyê çî be û li dawiyê her kes meraq dike. Şer, şerê rewşenbîran û rewşenbîran e..

Hîna pênuşa min di nava tiliyên min de ye. Ji çavekî bi hêvî li hemû rewşenbîr û nivîsaran dinêre. Hêvîdar im, ku di vî şerî de rastî bi ser bikeve...

MED televîzyona me hem

Şivan hozanekî kurdan î herî navdar e. Di nava kurdan de, kesên ku li dengê wî guhdarî nekiribe û li dijî neyarên kurdan hêrs nebûbe belkî tune be. Ew bi hunera xwe di hişyarbûna kurdan de, xwedî roleke mezin e. Gelek mirov telefonî MED-TV dikin û dibêjin "Hûn çima Şivan dernaxin?" Hinek jî dixwazin ku Şivan ji binî dernaxin televîzyonê. Berpirsiyarên MED'ê jî dibêjin, "Me, ew dawet kiriye, rê lê negirtiye, ew dernakeve..." Her kesî di vî warî de tiştek got, lê tenê deng ji Şivan derneket. Ji bo ku gel, fikr û dîtinên wî jî hîn bibê; hevalê me RAHMÎ BATUR bi Şivan re hevpeyvînek çêkir

Sivan kî ye, li ku bûye, zarokatiyeke çawa derbas kiriye? Her çiqas kurd hemû we nas bikin jî, em dixwazin; hûn xwe û malbata xwe hinekî bi me xwendevanên me, bidine naskirin.

● Ez ji navbera Wêranşar û Siwêrekê me. Qeyda navnama min li ser Siwêrekê ye. Pişt re em derbasî Wêranşarê bûn. Siwêrek û Wêranşar girêdayî Ruhayê ne, lê bêhtir me xwe Diyarbekirî dihesiband û em bi devoka Amedî deng dikin. Me xwe bêhtir nêzikî Amedê didît. Ji ber ku Diyarbekir bêhtir kurdî bû û Ruha zêdetir di bin destê ereban de bû, me di navbera Ruha û Diyarbekirê de ferqiyetê didît.

Di sala 1955'an de, ku dibêjin "Sala

berfa sor" di meha kanûnê (berfanbar) de, di zivistaneke gelek sar de, ez li gundê Soriyê ku xwediyê girekî tûj û bilind e, çêbûme. Tabî tarîxa kurdan di vî warî de ne pir eyan e, ne pir belî ye, lê li gorî gotina dê û bavê min; "berfa sor" di sala 1955'an de bariye.

Di şeş-heft saliya min de, dema bavê min xwest min bi xwendin bide, ji ber ku li gundê me mekteb tune bû, me bar kir, em çûne gundê Qerûkê. Qerûkê saetek rê ji me dûr bû. Gundekî xwediyê zêdeyî sed malî bû. Pir kes, ji gundên biçûk, zarokên xwe li Qerûkê bi xwendin didan. Min xwendegeha destpêkê li wir qedand. Û di pey re jî ez çûme Ruhayê. Ortoqil û lîse min li Ruhayê qedandin.

Hûn çend xwişk û bira ne û çend zarokên we hene?

● Em ji dayika min neh xwişk û bira ne. Dayika min di sala 1973'an de çû rehmetê û bavê min careke din zewicî. Û ji dayika nû jî niha şeş xwişk û bira hene. Yanê; em panzdeh xwişk û bira ne.

Eşîreke tam...

● (Bi ken) Erê, eşîrek tam mezin e... Ha, te got eşîr; navê eşîra me jî, Şêxan e. Ji me, mirovên xerab jî derdikevin, mirovên baş jî derdikevin. Necmettin Cevherî, Karakeçîlî, Fehmî Işıklar... ev ji eşîra me ne. Eşîreke mezin û fireh e... Kurekî min heye, navê wî Serxwebûn e. Ji kurê min muzîkarekî jîr û baş derketiye. 15 salî ye. Hemû aletan lê dixê, hêviyeke me ya mezin jê heye ku, hem kurdekî baş û hem jî hunermendekî baş jê derkeve. Tiştên di min de heye min dayê....

Di wê demê de, ji aliyê siyasî ve rewş çawa bû?

● Pir kes ji me welatperwer hebûn; rehmetiyê Faik Bucak û Kemal Badîllî pir tesîr li hêla Siwêrekê û derdora wê kiribûn. Eleqeya bavê min bi wan re gelek hebû û di bin tesîra başûrê Kurdistanê de mabûn. Ji şexsiyeta Berzanî gelekî hez dikirin. Wê demê, xelkê xelasiya xwe bi vî awayî didît, berê xwe dida wê hêlê.

Û mesela Şêx Seîd, a Dêrsimê jî gelek carî di cemaetên me de dihatin gotin. Li odayên gundan millet dihatin ba hev û bi dûvdirêj çirokên kurdî digotin. Em di bin vê tesîrê de bi xwe hesiyan.

Çawa ku hûn dibêjin, bavê we xwendî bû...

● Bavê min ne xwenda bû, hinekî mela bû.. Mela hemû di bin vê tesîrê de ne. Di bin tesîra Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî û Cegerxwîn de gelekî mane. Mela welatperwer in jî... Çirok û şîrên kurdî li ba wan gelek bûn û pir di bin tesîra hereketên kurdan de bûn...

We di warê muzîkê de ji kîjan noqteyê dest pê kir û hûn niha gihîştine merheleyeke çawa? Yanê hûn dikarin di warê hunerê de îroya xwe bi çavê nixandinê, bidine ber paşeroja xwe?

● Milletê kurd ji her hêlê de girêdayî ye. Wekî di zindanê de, di hepsê de ye. Nehîstine di warê nivîsê de gelê

kurd karibe berhemên xwe bi nivîsandinê bide. Gelê kurd di destê xwe de yek îmkân dîtiye; hikayetên xwe, şer û leca xwe, dew û doza xwe hemû bi stranên bi kar anîne û di vî warî de kulturek kurdan a mûsikiyê pir dewlemend heye. Dengbêj dihatin li şevbuhêrkan rûdiniştin û bi dûvdirêjî stran digotin. Bilûrvan rûdiniştin, bilûra xwe lêdixistin. Car hebû dahol û zirne dihat, gel şahiyên mezin dikirin. Tiştên folklorîk, tiştên mûsikî di nava gelê kurd de pir çih girtibû, cihekî pir giran bû. Ji ber vê jî stranên kurdî pir bi mana ne. Îro tu dibînî; hunermendên Tirkiyê yê meşhûrên wan kurd in...

Ez di bin vê tesîrê de gelek mam, bi xwe bi vê kulturê rabûm, bi vê kulturê hejîyam... Dikarim bibêjim min pir baş girt; stran û ziman û edebiyat û çirok û hikayet û hwd... Lê tiştin hebûn li xweşê min nedîçû, ji ber ku huner û hunermendiya kurdî di bin bêşexsiyeteke pir mezin de bû; ya tuyê hunermendê kurd bûya li ber deriyê axan, began û vir de wir de bigota, wê geştê te bidana te, yan jî wê te tirkî bigota, li nav tirkan bûbûya hunermendê tirkan. Tirkan çendî qîmet bidana jî, lê tu kurd bûy, dîsa te şexsiyeta xwe nedidît. Bi vî rengî min nedixwest ez bibime hunermend, min dixwest bixwînim. Gava ez hatim Enqereyê min xwend, ji her hêlê Kurdistanê xwendevan hebûn û gelek welatperwer bûn; hêviya wan li ser başûrê Kurdistanê bû, gava başûrê Kurdistanê têk çû; ew xwendevan pir ne-rehet bûn û xwestin ew bi xwe tiştêkî bikin.

Tesîreke wan î pir mezin li ser min hebû, ez teşwîk kirim. Gotin: "Eger tu van stranên bixwînî, wê di warê şiyar-bûnê de feydeyêke pir mezin bide gelê kurd, me divê tu bistirî" Û ji bo min jî mesela şexsiyeteke bû. Armanca min jî ev bû; ku ez gava bibêjim, pêwîst e karîbim şexsiyeteke bidim huner û hunermendên kurd, hunermendî bikeve xizmeta gel û welêt. Bikeve xizmetê ve dew û dozê... Ez dikarim bibêjim tiştên min dixwestin jî, bûn... Ev kar berde-wam bû, lê hûn jî dizanin ku şertên welat ne pir baş bûn, ez mecbûr mam, min welat berda.

Di vê pevajokê de, di vê demê de gelek tişt hatine guhertin: Hinek hereket vemirîn çûn, hinek din rabûn û hunermendên nû derketin. Me jî xwest li gorî demê em xwe eyar bikin. Tabî her tiştên ku mirov dixwaze, her gav bi dest ve nayê.

Heta niha we çend kaset dagirtine?

● Ji bo zarokan, ji bo Gulistanê min kaset çêkirin. Kasete Ciwan Haco ya yekemîn min çêkir.

Kîjan kasete Ciwan Haco we çêkir?

● Ya destpêkê, ya bi navê "Hawar e hawar e, birano hawar e" û yê min bi xwe jî; heta niha min 16 kaset çêkirine.



yan e

3 selikên (plak) min hene, 4 CD'yên min û gelek filmên video yên ku min çekirine, hene.

Berê stîleke we ya tembûrê ya taybet hebû, mirov dengê tembûra we di nav dengê sed tembûran de bi hêsani nas dikir. Lê di van kasetên we yên dawî de, ev taybetiya we ne diyar e, wekî tembûra alewiyan e, sebebê vê çi ye gelo?

● Rast e heqê we heye. Tu dizanî; tişt heye gel hez dike hunermend baş hez jê nake, tişt heye hunermend hez dike gel baş jê hez nake. Yanê tê nagihêjê, wê noqtê nabîne. Taybetiya tembûra min heye, rast e, ez dikarim bibêjim taybetiyeke wê ya kurdî jî heye. Lê tembûr gava deng dide tembûr e, tembûra kurdî ya tarîxî heye, lê di destê kesî de tune ye. Yanê tesîra ku em di binî de mane, bi wê em gihîştine; em bi wê dibêjin. Di warê orkestrasyon û pirden-

giya muzîka kurdî de xebateke taybetî nebûbû. Yan jî tecrûbeyeke mezin tune bû. Tirk dibêjin 'deneme' min xwest e. Tirk dibêjin 'deneme' min xwest e. Ev demeyan (azmûneyan) bikim. Îcar ew muzîka orkestrasyoniya ku heta niha çêbûye ya di bin tesîra Ewrûpayê de ye, ya di bin tesîra ereban de ye. Ne kurd tenê, tirk, faris jî di bin vê tesîrê de ne; dîkin nakin, nikarin xwe jê xelas bikin... Niha tu bibêjî muzîkeke kurdî jî, xusûsî di warê orkestrayê de dikarim taybetiyeke Şivan Perwer, ya hunermendekî din bibînim û orkestra çêbikim; bi rastî pir zehmet e. Yanê em ketin nava serlêdanekê. Serlêdan e, heta niha tiştên me kirine. Û hunermendên kurd, bawer dikim vêga li ser vê disekinin, ez jî bi xwe pir li ser disekinim. Mesela; strana Derwêşê Evdî, ez dixwazim wekî opera bikim, lê operayeke çawa gelo? Em çawa bikin? Lazim e mirov pir li serê bisekine, bifikire. A va çar- pênc sal e ez li ser vê stranê difikirim; orkestrasyonê çawa ku ez karibim ruhiyeta strana Derwêşê Evdî bi rastî bidim, gelê kurd jê fêhm bike. Ev îş tenê bi tembûrê nabe. Bi tembûrê her gav mirov dikane bike. Ew stranên kevin ku tu dibêjî; wek wan her gav ez dikanim bibêjim û her gav jî ez dikarim çêkim. Lê pêşveçûneke bêhtir lazim e, pêşvebirineke bêhtir lazim e... Li ser vê ez dixebitim. Mumkun e mîlet jê ne memnûn be, lê bila zanibe; ez di nav serlêdanê de me û mumkun e di pêşerojê de tiştên hîn baştir jî çêbin...

Li ser rexneyên ku di vî warî de li we dibin, çi dibêjin?

● Ez her gav rexnen mîlet divêm. Yanê tiştên ku ez çêdikim divê rexne bibin. Rexne nebin, em nikarin rastiya xwe jî bibînin. Yanê em di her tiştî de ne rast in. Em serlêdanan jî dikin, tê de her gav ne rast in, tiştên em dikin jî her gav ne rast in. Divê mîlet lê guhdarî bike, rexne bike û rexneyên mîlet di van



waran de werin qebûlkin. Bi rastî, di vî warî de taybetiya min heye û pir kesan jî taqip kir. Ez bawer dikim tiştê baş bû, ji bo muzîka kurdî. Û ji bo ruhiyeta kûrahiya kurdaiyê... Divê hunermendên kurdan bikevin nava xebateke kûr... Yanê; lêgerîneke kûr, ku em kanibin di orkestrasyonê de şeweyeke muzîka kurdî bibînin. Ev pir pir muhîm e. Ew kesên ku li ser muzîkê xwendine, em bibêjin kompozîsyon xwendine û di vî warî de muzîka klasîk baş dizanin, tiştên harmonî baş dizanibin, divê Beethoven û Girapetê Xaço bikin wekî hev, divê Mozart û Arîfê Cizîrî bikin yek.

Ez dibêjim li gorî min programan bidine min, ez çêbikim. Ew dibêjin; tembûra xwe hilde were rûnê û stranên bibêje. Ew kesên ku tembûra xwe radikin û diçin, pir serfiraz nabin. Ez dibêjim; ez vê programê wiha dixwazim, wiha bikin, derxin. Çi mesela? Klîp çêkim, çi mesela; şowên baş çêkim, çi mesela; sê-çar kamerayên xwe bigirin, konsereke mezin çêkin û li gorî wê mirovan derxin.

Divê ein muzîka modern û muzîka klasîk ên kurdî bigihînin ba hev. Di nav wê de taybetiyeke muzîka kurdî, a xweşik derxin holê, da muzîka me bikeve şeweyeke ilmî, şeweyeke zanistî. Divê kurd berê xwe bidine dinyayê... Ku tu bixwazî muzîka kurdî xwezayî be, lazim e tu muzîka dinyayê jî zanibî.

Dema ku we dest bi stranbêjiyê kir, muzîka kurdî di çi halî de bû û îro di çi halî de ye?

● Wê gavê mîletê kurd di bin zilm û zorê de dinaliya û polîtîka asîmilasyonê ya pir giran li ser mîletê kurd hebû. Gel ditirsiya li muzîka kurdî guhdarî bike. Û pir kurd jî hatibûn xapandin,

xwe tirk dihesibandin. Ji bo baş û xweşik tirkî biaxivin ketibûn yarişê (pêşbaziyê)... ez dikarim bibêjim ku me ji sifirê dest pê kir. Di destê me de îmkân û materyal tune bûn. Lê îro gelek heye. Wê gavê berî her tiştî hişyarbûn lazim bû; diviya gelê kurd bi muzîka xwe hişyar bûbûya û li ser qîmetên xwe yên dirokî, muzîkî, edebî û siyasî bisekîniya. Rewş ew bû. Lê dem hat; gelê kurd hişyar bû. Û êdî tiştên nû lazim bûn. Wekî gava din min gotî; me serî li tiştên nû xistin. Lê vê gavê bêhtir tiştên nûjen ji me tîn xwestin, divê em bêhtir bixebî-

mîletê kurd muzîka xwe guhdarî bike, ne ya ereb û faris û tirk û vir de wê de... Muzîka me wî tîr bike, wî îkna bike. Muzîka kurdî hate roja îro jî, hîn îkna nake, ji ber vê jî pir kurd em dibînin; muzîkên din guhdarî dikin.

Ji bo hunermendên Başûr û Rojhilat û bi taybetî ji li ser Mehemed Şêxo û tembûra wî, hûn dikarin ji me re çi bêjin?

● Mehemed Şêxo mirovekî welatperwer bû, kurdperwer bû. Tembûreke pir bi taybetî lê naxe, ji ber ku tembûra wî bizûkî ye, ev tembûr ji yewnanan tê, ereb jî dibêjin bisq û wan jî şeweyek danê. Mehemed Şêxo jî li gorî xwe şeweyek ditiye. Ev kalîta Mehemed Şêxo ye. Tiştên Mehemed Şêxo yê mezin; stranên xweş çêkirine. Stranên pir delal, di cihê xwe de çêkirine. Stranên wer delal çêkirine ku qet winda nebin. Ev aliyê wî, gelekî baş e.

Hunermendên din, yên Başûr û Rojhilat?

● Dixwazim yên Bakur jî bibêjim. Ez vê gavê hunermendên Başûr û Rojhilat di ruhiyeta kurdî de pir baş dibînim. Ew zimanê xwe baş dizanin, bêhtir di bin tesîra muzîka xwe de mane.

Rojhilata Kurdistanê, hunermendên baş dirxistiye; weke Seîdê Ezzerê Kurdistanî, weke Hesen Zîrek, weke Mehemed Mamle, weke Nasir Rezazî, weke dengxweş mezin Elî Şarux... Pir hunermendên baş. Ev kalîte, vê gavê li bakurê Kurdistanê tune ye. Kesên mezin ku bakur derxistine, mecbûr mane, çûne başûrê welêt. Weke Arîfê Cizîrî, Hesenê Cizîrî, weke Meyremxan, weke Kawîz Axa... Başûr jî hunermendên mezin derxistine; weke Elî Merdan, weke Tahir Tewfîq, weke Tîpa Silêmaniyê, Tîpa Duhokê... û gelek kes û tipên (komên) din, muzîkarên pir baş...

Dûmahîk rûpel: 15

Hemoyê biçûk hûn in!

Li rojhilat çesnê edebî yê herî xurt şîr e. "Pêşî gotin hebû", wek Tewrat dibêje, cihê kevnare yê gotinê ev erd bûn. Li rojhilat gotin di şîrê de veşartî bû. Mixabin berî bi 200 salî "gotin"ê ji vî erdnîgarê koç kir. Ronesansa rojava bi nesrê dest pê kir. Şîr, bi giştî nezm, demeke dirêj wek çesneke "civakên prîmîtîf" hate dîtin. Piştî Ronesansê bi demekê rojava; şîr, xurtiya gotinê ji nû ve keşî kir. Şîr guherî, gotinê xwe nû kir. Şoreşa sanayiyê fikr û mantalîteyên civakê tev de guhertin. Teknolojî, derdora ferd teng kir, derî li ber maneyê hate girtin. Di jiyana sedsala me ya mekanîk de şîr, deriyekî vekirî ye, stargehek e.

Stargeh, di şîra kurdî de jî çêdibin. Şîreke paqij, xwerû, ji qeyd û bendan dîr bi kurdî jî tê nivîsîn edî. Şêrko Bêkes yek ji nûnerê vî şîrê ye.

"Piste Pistek"ê çend caran bixwînin. Wek dîmenekê mekan û taswîrên wê bînin ber çavên xwe. Hûnê bibînin di wê dîmenê de tiştekî kêman jî zêde nîne. "Li kuncikê Meydana Mezin/li nav dilê bajarê Şamê," hûn dikarin ji dêla Şamê Stenbol, Tehran, Bexda an jî Santîago, Qudîs, Harlem binivîsin. Ji dêla "Hemoyê biçûk" hûn dikarin navê yekî filîstîni, reşîkekî Efrîkî binivîsin. Tiştek ji şîra kêman nabe, xurtiya şîrê Bêkes jî di vir de ye.

Û "Hemoyê biçûk î boyaxçî..." Zarokê koça sedsalan. Zarokê welatekî bindest. Hemoyê biçûk hûn in! Hemoyê biçûk em in! Hemoyê biçûk pêşeroja welat û miletekî bindest e. Psikolojiya wî, psikolojiya miletekî ye, psikolojiya zarokên kurd tev de tîne ber çavên mirov.

(Ji bo agahdariyê em li vir, pêşgotina kitêba Şêrko Bêkes diweşînin.)

Şîra Bêkes

Serhildana tevgera Ruwange, ji nûkirina şîra kurdî ya nûdem re pêngava duwemîn bû. Yek ji pêşengên vî tev-

gerê şairê bi nav û deng Şêrko Bêkes e.

Pêngava yekemîn di navbera her du serê cihanê de hat avêtin. Di wan deman de komek xortên şairên kurd, ji wan; Evdîla Goran, Reşîd Necîb û Şêx Nûrî Şêx Salîh, şîra kurdî ji kevnîtiyê xelas kirin, ew xelaskirin tenê nebû jêkirina kot û bendê wezn û erûza erebî ji şîra kurdî. Lê ji aliyê naverokê ve jî şîra kurd kete qonaxeke nû. Bi vî yekê kêşê şîra folklorî ya neteweyî ket nava şîra kurd. Zimanê şîra kurdî di zemanên bûrî de zimanekî tevlihev bû. Xwendevanê kurd nikaribûn bi hêsanî jê fêhm bikin. Ew ziman li ser destê Goran û hevalên wî bû zimanekî zelal û ronî.

Di destpêka heftê yê vî sadsalê de Xwendengeha Goran di şîra kurdî de xwe pir dide xuyan. Tevgera Ruwange piştê beyana 11'ê Adara 1970'yan ket şûna wê xwendengehê. Qonaxeke nû di jiyana siyasî ya kurd de dest pê kir û serdemek nû ji bo jiyana edebiyata kurdî bi xwe re anî. Şîra kurdî pence-reyêke mezin li ber bayê şîra cihanî vekir. Ji aliyê din ve jî şairên kurd ketin ser şopa feydegirtinê ji folklor, ef-sane û edebiyata devkî ya kurdî.


Şêrko Bêkes kurê şairê welatparêzê mezin Faîq Bêkes e. Ji piştî 1970 û pê ve pêşevanê şîra kurdî ya nûdem e. Di sala 1987'an de ji PEN Klûba Swêdî ve xelata Toxolîskî wergirtiye. Piştî damezirandina Hikûmeta Kurd li Başûr, Şêrko Bêkes bû yek ji parlementerên kurd û piştî hingî jî bû wezîrê kulturê, niha jî li Swêdê jiyana xwe didomîne.

Şîrên ku di vir de ji soranî (kurmanciya jêrîn) hatine wergerandin şîrên kurdî in ku Şêrko Bêkes bi xwe çêkerê ev cûre şîrê ye di edebiyata kurdî de. Bêkes ji vî cûreya şîrê re dibêje "şîra poster." Ji xeynî vî cûreyê Bêkes bi gelek awayên din jî şîran dinivîse.

A. KESKIN

Şêrko Bêkes kî ye?

Şêrko Bêkes, di sala 1940'î de li bajarê Silêmanî hate dinyayê. Kurê şairê navdar Faîq Bêkes e. Xwendina xwe ya bingehîn û navîn li Silêmanî û Bexdayê tamam kir. Bêkes, di nûkirina şîra kurdî de cihekî girîng digire. 2 berhemên wî yê tiyatroyê û li dor 10 dîwanên wî yê şîran hene. Demekê li başûrê welêt bû wezîrê çandê. Şêrko Bêkes, niha jiyana xwe li derveyê welêt, li Swêdê didomîne.



Wêne: Guhdar Selaheddin


PISTE PISTEK

Êvar bû
Hemoyê biçûk î boyaxçî
li kuncikê Meydana Mezin
li nav dilê bajarê Şamê
serê westiyayî tewandibû
wek firça nav destê xwe
laşê xwe yê zirav bilez bilez
dihejand.

Hemoyê biçûk î aware
di ber xwe de
bi peste pist
ev digot:
Tu mamoste piyê xwe deyne!
Tu bazirgan piyê xwe deyne!
Zabit.. casûs.. leşker... celad
mîrovê baş.. û mîrovê piç...
Hûn hemû!
yek li pey yekî piyê xwe deynîn

kes nema
tenê Xudê ma
Ez bawer im
li wê dinyayê jî
Xudê ji bo
boyaxkirina pêlavên xwe
wê gazî kurdekî bike
kî dibê "ew kurd ne ez im"
Ax dayê!
Tu dibê pêlavên Xudê çiqas
mezin bin
çend numre li xwe dike?
Lê ji bo pere!
dayê tu dibê Xudê wê çiqas
bide?
Nişe: Ji pirtûka Şêrko Bêkes a bi navê
"Ji nav şîrên min" Weşanên Avesta,
Wergera ji kurmanciya jêrîn
Rûken Bağdu Keskin - Bedran Hebib





HEJMARA 38'an a kovara mehane ya çand, huner û edebî Nûbiharê derket. Kovar di vê hejmarê de mijara "Umetçîlî û Enter nasyonalîzm" ji xwe re wekî sernavê sereke dinîqîne. Bêpîrsê Giştî yê Nûbiharê Sabah Kara, di nav çarçoveya morovahiye de cihê olê û nijadê, dinirxîne.

"Paqijkarên gunehên rêjîma rihperest (nijadperest)" navê nivîsa Memê Alan e. Ev nivîs li ser hin kesên wekî Fetullah Gülen û Mehmed Kırkinci û peywendiyên wan ên bi dewletê re hatiye nivîsîn.

Raserîn Baravî ji tirkî çiroka Esmâ Ocak bi navê "Berdêlî" wergerandiye. Tehsîn İbrahim Dostî bi "Erê heyvê", Aqil Mihacir bi

"Rêya Domandina Têkoşînê", Esra Piranî bi çiroka bi navê "Xwarîna kizirî" û Adem Murteza jî, bi nivîsa xwe ya bi navê "Zimanê zikmakî nexşa qedere ye" di vê hejmarê de cih girtine.

Ji bilî van, helbest jî di kovarê de hene. Sabah Kara helbesta Baba Tahîrê Üryan ji lori wergerandiye bi navê "Dubeytî." Alaeddin Heyderoğlî jî şîrek bi navê "Hela Virda" jî tipên erebî wergerandiye latîfî. Helbesta Mele Qasim bi navê "Nuqurç" û ya Koyo Berz jî bi navê "Newe ra" di vê hejmarê de heye.

Rojîn Zelal jî, li ser peyvên kurdî û arî yên ku ketine zimanê tirkî, li gorî rêza alfabe-yê (herfa- A) radiweste.

Xelîl Amed bi pêkenokên gelêrî rûpela zarokan geş kiriye.

RÛDAN

Li ser Şêx Seîd û serhildana wî panel:
Hereketa Şêx Seîd neteweyî bû

TÎŞK

LERZAN JANDÛL



Kilam kirmancî, ziwan tirkî, fikriyene zazakî

Cematê Dêrsimî Berlin de roja 03.02.1996 de binê namê "Şewa Dêrsimî" de jû şewe viraşte. Serba nayê afîşî ebi wêneyanê (resmanê) Sey Rizay amê bî viraştene. Ze her kesî ma jî hêviye kerdê ke, bawar kerdê ke, na şewe de ma hem şikîme goş re kilamanê xo ser nîme, kulturê Dêrsimî ra tenê nimûnan bivînimê. Û pêrinê ra muhîm jî, ma şikîme hebê kirmancî bifikirîme. Meseleyan de tene jî na pencere ra niyadîme. Reyna Sey Rizay û Şehîdanê bînan biyame xo vîrî. La belê çî feyde. Hêviya ma, bawariya ma laserê ziwane tirkî û waştene zazakî/zazatiyene de şî. Namê şewe "Şewa Dêrsimî" biye. Rakerdena şewe ebi kirmancî jî amê kerdane. Hozanan Şewa Dêrsimî de hem bi kirmancî û hem jî bi tirkî kilanê xo vafî û zerê xo kerd rehet. Qesekerdênê bîni jî, yanê zivane şewe tirkî, ebi "zonê weşî" bî. Mesejî, zerê qesenê politikan de zizatênî biye.

Çi ra tirkî? Kirmancî girêdayê tirkî yo. Tirkî ke mero qesekerdene, kirmancî qese nêbeno? Yan jî nê mordemêkî ebi kirmancî nêşikîne bifikirîye û qese kerê? Ma şikîme nê persan zaf kerîme. La belê mesela na niya. Mesela a wa, ke mordem ganî cewabanê raşt bidêro nê persan. Zaf zelal û eşkera wo, nê mordemêkî bê tirkî nêşikîne jû sahata xo, jû roja xo derbaz kerê. Nê, ebi nakê xo girêdayê tirkî yê. Çê xo de, domanê xo de Tirkî qese kenê, Tirkî fikirîne. Her çiyê xo bingê tirkî ser ro ava kerdo. Se vanê vacê, ma nayê her roj ebi çimanê xo vînenîme, ebi goşanê xo heşnenîme. Nê mordemêkî teyna, demo ke tenge de manênê, yan jî demo ke biwazê probleman veçêrê, o zaman vanê: "Ma zonê ma esto. Lehçe bo kî, na lehça ma wa. Gere her ca de, ha televizyon de ha roşanan de bêro qesekerdene. Gere lehça ma her ca de bêro nivisnayene." Na dirûtî ya. Na bêşermênî ya. Şima nêşikîne jû aktîvîteya xo ebi lehça xo, yan jî ebi zonê xo bikerê? Nê xêr, na nêna re şima. Şima nêşikîne jû aktîvîteya xo ebi zonê welato ke şima tê de rê, bikerê? Nê xêr, na ma rê giran a. E... axirê, hetanî key? Eke bêro vînde ro, zonê şima xêlê derg o. Şar ked, emeg dano, çîmiyan ano wertê, şima qulpan nanê pa. Çik o? Ma hetê ma de na qesa niya nêna vatene. Namê nê çî hetê ma de niya niyo. "Ma to viraze? Ne, a çem a. Nê mordemekan derheqê "zonê" xo de hetanê nika çiyêde bingeyî nêkerdo. Wuncîya na derheq de karêde efektif nêdiyo. Serba zav û zêçê xo, serba amayena zav û zêçê xo çiyê biqedr niyardo werte.

Hêştire (Deva) ra vato: "Kotiyê to çewt o?" Deva vato, "Kotiyê mi raşto ke?" Kotiyê nê mordemekan çewt o? Kamcî hetê nînan raşt o ke? Şewa Dêrsimî, şewa Kirmancan virazenê. Heto bîni ra "Zazatênî" kenê. Kirmancan kenê "Zaza". Welatê ma de Kirmanciye de (tirkî û xêlê zonanê bînan ra tercumekerdene Kurdistan de) gonî şona; insanî, dewî, dar û ber, heywanî, ko û deystî ênê vênayene, nê mordemêkî teyna "Tunceliye" vînenê. Samimî nî ye. Nê "Dersimî" jî nî ye. Nê ya "Tuncelî" ye, yan jî "Mamîkîtiye" kenê. Bêguman her çayê Kirmanciye de ferqa kulturî esta. Tesîrê dînî, jiyana sosyal û kulturî ser ro esta. Dêrsim de na kirmanc-qizilbaş-alevîti ya. Ganî nê ferqî bêrê parêznayene, qorîkerdene, avêberdene. Her çî jû diyene, yan jî "jûtiye" hem rind nî ye û hem jî raşt nî ye. La belê qasê nayê girskerdena nê ferqanê kulturî, dişmenkerden û çiyadiyena nê ferqan jî bawariya ra dot, mordem biwazo mewazo, dişmentî ya. Xizmeta koledaran, gonîweran kerdan a.

eke nê mordemêkî ebi zereweşîye, dilseziye, bê hîle, bê dek û dubare bawar kene, ke ê bi xo "zaza" yê, xo "zaza" vînenê, wa "Zaza" bê û "zazatênî" bikerê. Hama "zazatênî" jî ganî ebi metodanê qîlêrina, karanê xirabîna mero kerdene. Ganî kêmasî, nezanayen û şaşîtiya tenê kesanê bînan, xirabîya dînan, xizmeta dişmenî kerdene rê bingê û sebeb mebo.



Ji milê çepê; Faik Bulut, İsmail Sarıoğlu û nivîskarê me İsmail Göldaş.

Saziya zanyarî û çandê BEKSAV, li bajarê Stenbolê, li ser serhildana Şêx Seîd, panêleke bi navê "Ji dîrokê (Tarihten)" li dar xist. Nivîskarê me İsmail Göldaş û nivîskar Faik Bulut, di vê panêlê de hereketa Şêx Seîd nîrxandin. Navê neviyê Şêx Seîd, Kasım Fırat jî di nav navên penêlistan de hebû, lê ji ber ku hinek problemên wî derketibûn, beşdar nebû. Nêzikî dused guhdar beşdarî panêlê bûn. Serokatiya panêlê, serokê BEKSAV'ê İsmail Sarıoğlu kir.

Nivîskar Faik Bulut, di axaftina xwe de, zêdetir li ser karakterê hereketê sekinî; di dijî wan ên ku dibêjin hereketa Şêx Seîd ne hereketeke neteweyî ye, hereketeke şerî ye, derket. Faik Bulut got, ev hereket bi rengên şerîetê neqîşandibe jî, hereketeke neteweyî ye. Bulut, got: "Dewlet jî, derdorên îslamiyên Tirkiyeyê jî, dibêjin ev hereket îslamî bû, ji bo xelîfetiye bû, lê 70 rojî cih û warên ku lê hikûm kirin, ka destên kê, piyên kê bîrî ne?"

Bulut, li ser bêwext destpêkirina hereketê sekinî û sebebê vê bêwextbûnê telgrafa Xa-

lidê Cibirî ku ji birayê xwe yê zabît re bi şîfre rêkiriye, da nîşan. Bulut li ser hejmarê kesên ku beşdarî serhildanê bûne û di serhildanê de hatine kuştin, hinek agahî dan.

Nivîskarê me İsmail Göldaş jî, di axaftina xwe de, li ser tîkiliyê Şêx Seîd û dewletên biyan sekinî, got: "Nivîskarên ku xwe memûrê dewletê dibînin, dibêjin îngilîzan Şêx Seîd teşwîkî serhildanê kirin, çek û pere dane Şêx Seîd, ev ne rast e. Kesî ne pere û ne çek daye Şêx Seîd." Göldaş got: "Bi a min; kêmaniya hereketê ya herî mezin ev e ku bi derve re tîkîlî danayne. Mafê her hereketeke neteweyî heye ku bi derve re, peywendiyên diplomatîk deyne."

İsmail Göldaş, piştî ku li ser hazirî û destpêka hereketê, şikestina hereketê û kêmasiyên hereketê sekinî, di dawiyê de jî, helwesta rojnamevanên tirkan ya li hemberî hereketa Şêx Seîd nîrxand. Göldaş, ji rojnamevanên wê demê mînak da, ku rojnamevanên tirkan bi îdamkirina kurdan çendî şad û kêfxweş bûne. Û mînakên xwe anî, bi helwesta çapemeniya îro ve girêda.

R. DILOVAN

Serhildana Şêx Seîd (rêzenivîs—2)

Şoreşê çima zû dest pê kir?



HEŞEN HÎŞIYAR

Li Bedlîsê çend zibatên ji rutbeya Xalid Beg biçûktir û ji uslûbên muhekemeyan jî bêxeber ew mehkeme dikan; jê re destûra girtina ebûqatek jî nedan. Dawî li îdama Xalid Beg û Yusuf Ziya biryaran; li gastîneke (meydaneke) Bedlîsê, li cihê wê qetlîama Ahmed Milk, her duyan bi dar ve kirin.

Wan sîleh nedan, ji ber wî qasî ji Kolordûya Heftan a li Diyarbekirê, leşker kişiya ser wan nestûriyan, ku tabûr û bêlûk piraniya wan kurd û kumandanên wan jî kurd ên wekî Binbaşiyê Erkanî Ihsan Nûrî (Ev kes di salên 1929 û 1931'an de fermandariya Şoreşa Araratê kiribû û di 1976'an de li Tehranê bi hingaftina motorsikletê hate kuştin; bi esbabeke siyasî an qedere nehate zanîn), Yûzbaşî Tewfîq Cemîl, Rasim, Xurşîd, milazim gelek bûn. Ji wan Riza, birayê Yusuf Ziya û gelek zibatên şef jî hebûn. Her wekî li jorê derbas bûye, ku di wan eyaman (heyaman) de Mebûsê Bedlîsê Yusuf Ziya ji Stenbolê hatibû, li wir hin partiyên li dijî Mustafa Kemal ên wekî İttihad Terakki, cumhûriyet û hin hevalbendên sultan, bi fortên vala serê wî dagirtibûn, ku ewê jî di nêzik de li ber hukmê kemalistî rabin. Wî jî bawer kiribû, bê ku zanibe tirkên Anadolê ji zemanekî dîr ve ji hêzdariyên sîleh û şoreşgerî ketine.

Belê Yusuf Ziya bi xudbînî û sergemiyeke tekane ji birayê xwe Milazim Riza re nameyek bi dest dişîne û dibêje: "Xwe hazir bikin" Riza wê nîvîsarê dide Ihsan Nûrî, ew jî bawer dike ku ew danezan ji Komîteya Merkezî ya Erzeromê ye. Bi wê gumanê her çar kumandarên gotî, bi navê munewerayê, leşkerên xwe kişandim çiyayên Hekarî yên Çelemerg (Culemerg) û Beytulşebabê.

Piştî çend rojan ji wan re xeber hat ku ew danezana Yusuf Ziya xeleteke mezin bûye. Lê, ji Firqa Duduyan a li Sêrtê bi fermana general elî (mezin) leşker kişandin ser wan. Piştî şerekî nedirêj her çar Kumandarên kurd bi navê laciyan siyasî derbasî Iraqê bûn; ku hingê îngilîz lê mandater bûn. Di nav îngilîz û tirkan de li ser Mosil kêşmêkê mezin hebû, ji ber siyaseta îngilîz nayêne qebûl kirin, lê zêde li wan wer hatin. Ji Mosilê ew birin Bexdayê; xwarina wan û generalên îngilîz yek bûn. Lê heşê wan ji wan şûn de, bi wê xeleta Yusuf Ziya, li destpêka şoreşê



bû. Bi daxwaza ku karibin ji alîkariya şoreşê re hêzeke dîtir bi dest bixin, ji îngilîzan re gotin: "Vêketina agirê şoreşê li Tirkiyeyê li ser rojan e. Em jî di wê sazmanê de aza (endam) ne, em dixwazin bigihêne Kurdistanê. Îranê ba Simiko." Li gorî wî zemanî ji siyaseta îngilîz nedixwest ku serê wan bi tirkan re bikeve gêjaniyan, her wiha Şêx Mehmûd (Berzençî) pêre şervanî bû; lê daxwaza her çar kumandarên kurd qebûl kir û 16 hezar dînar jî dane wan û bi jîpên xwe yê eskerî ew derbas kirin ba Îsmail Axayê Şikakî. Berî ku herin ba Simiko xwestin bigihîjin Şêx Mehmûd, lê îngilîzan ew rê neda wan û gotin wan: "Şêx Mehmûd dostê tirkan e,

hûnê çawa herin ba wî?" Ji ber wê çendê çûna ba Simiko, ji wan re bû daxwaza yekemîn, lê sed mexabin piştî ku di 11'ê adara 1925'an de Şoreşa Şêx Seîd dest pê kir.

Wan her çaran ji Simiko re gotin: "Divê em jî, ji herêmê Wanê deriyekî şer li tirk bidin vekirin." Lê bi tu awayî Simiko qamî nekirin (Ji wan kumandan, ev danezan ji devê Yuzbaşî Tewfîq Cemîl ji min re hate gotin).

Sebebê destpêka şoreşê girtina Xalid Beg,

Belê li gorî programa şoreşê, destpêka şoreşê wê dawîya gulanê bûna, lê

wê bûyera Hekariyê, tirk li veşartiyên sazmanê, şiyar kirin. Wekî tê gotin ku guleya ji devê tifengê derket di sa vengere wê qawenê; piştî ew kumandan derbasî Iraqê bûn, tafîl bêhêvişandin (bêhivzkirin) Kolordûya Heştan girte ser mala Xalid Beg û ew girtin; deftera navên libatan (endam) jî pê re. Di wê şevê de alahiyek siwarî li dorê, berê wî dane Bedlîsê, çawa ku Yusuf Ziya, Hacı Mûsa Begê Xetî û hinên din jî li Bedlîsê girtibûn.

Di wê rêwingiyê (rêwîtiyê) de li herêmê Kela Melazgirê karwaneke Heyderan li bergeha wan derbas dibû, Xalid Beg bi zimanê kurdî ji wan re got:

—Silavên min li Saleh Beg bikin, ez bêxercî me bila ji min re 500 kaxezên tek tek û nû bişîne. Va ez diherim Bedlîsê.

Salih Beg ne li mal bû, wan karwanan êvarê li dîwanê, ji Huseyîn Paşa re gotin:

—Xalid Beg wekî girtî xuya bû, siwar û li dor wî siwariyên leşkerên tirk, ji me re got: Va min dibin Bedlîsê, bila Salih Beg ji min re 500 kaxezên nû û tek tek bişîne.


Bêyî ku Huseyîn Paşa bîrek bi maneya pîrsê bibe "Ha ha", kenîya û got: "Xalid Beg doza mezinatiya kurd û Kurdistanê dîke, di bêrika wî de pêncsed nîn e."

Şeva dîtir kurê wî Salih Beg hate mal, jê re gotin:

—Salih, hevalê te Xalid Begê Cibrî li Kela Melazgirê wekî girtîbe, li dor wî gelek siwariyên tirk dibirin Bedlîsê, ji karwanên me re gotiye: "Bila Salih ji min re 500 kaxezên tek tek û nû bişîne" Salih Beg gazî wan karwanan kir û pîrsî ku kengê bû, wan got: "Pêr bû." Salih Beg, bi her du destan li serê xwe da û hêstiran ji çavên wî rêz kir, zivirî ser û got: "Ango tu jî generalekî milişyayî, ma te çawa nas nekir ku ew pênc sed kaxezên nû û tek tek yanê xortên cengawir bişîne pêşiya me; lê sed mexabin û hezar keser gihandin Bedlîsê."

Belê bextê reş, eger hingê Salih Beg li mal bûna Xalid Beg ji wan digirtin.

Her wekî li deverên dî, gotin derbas bûye, li Bedlîsê çend zibatên ji rutba Xalid Beg biçûktir û ji uslûbên muhekemeyan jî bêxeber ew mehkeme dikan; çawa jê re destûra girtina ebûqatek jî nedan, ji ber ku mehkeme bêqanûn bû, bi awayekî şekî çend rojan wek listikek komîdyakî (komedyayeke) diramî bi wan re çend civîn girê dan û dawî li îdama Xalid Beg û Yusuf Ziya biryaran, li gastîneke (meydaneke) Bedlîsê cihê wê qetlîama Ahmed Milk, her duyan bi dar ve kirin. Piştî hingê li go-



Seyid Ebdulqadir



eskerên we jî xilas nabe.” Alî Saib tavil zebtek nivîsî şande leşkerên xwe, “Ku divê hûn ji dor gund dûr kevin bidin ser riya Erzerom em jî digihine we.” Piştî ew leşker ketin ser riya Erzeromê paşê ji wan re gotin: “Rabin siktir bin.” Bi peyatî çûn gihane eskerên xwe. Piştî gihane Erzeromê ew serpêhatiya xwe ji General Kazim (Karabekir) dane zanîn, lê tu herekeya general çênebû.

Piştî îdama Xalid Begê Cibirî û Yusuf Ziya, tevaya azayên sazmanê xwestin, kesek guh li wan nekir, a diduyan bi berhevkirina sileh ve rabûn; bi wê daxwazê jî tu havil bi dest nexistin. Tevaya eşîran welê bi sertî bersiva wan dan. Ji wê payîza navîn heyatî meha şubatê (reşemiyê) tirk û kurd her du jî bê tevger man. Her yek ji wan li keys û fesalekê digeriyan, nemaze di nav wan azayên Komîteya Merkezî de zêdetir dayîn û standin û şewirên siyasî hebûn, ku civîneke mezin ji wan re divabû.

Kongreya Çiyayê Çanê

Di 1'ê şubata (reşemiyaya) 1925'an de ji azayên Sazmana Ezeromê ronakên siyasî, kumandanên milîşya, serekên eşîran, di nav wan de hin şêx û mela jî, nêzikî 300 kesî li Çiyayê Çanê kongreyeke siyasî û tarîxî hate girêdan; di gotin, daxwaz û biryaran de, wê civîne ser roj dirêj kir. Zêdeyê nivî gotin: “Divê em her yek di mentîqeyên xwe de bi serkarên hikûmeta tirk re bidin û bistînin, gumana hereketeke me ji heşê wan dûr bixînin, heyatî ku em bigihîjin zemanê berî biryardayî, dawîya meha gulane.” Ji bona ku niha leşker nekişînin van navçeyan, di wan guftûgoyan de Şêx Seîd li wan guhdar bû.

Dûmahîk heye

ri deftera girtî, libatên wê sazmanê tevde xwestin, ku yek ji wan Şêx Seîd bû, lê kesek bi daxwaza wan ve neçû. Her kes li nav eşîrên xwe man, tirk jî nikaribûn herin wan bi zordestî bigirin. Çawa ku ew daxwaza zorkerî li nav Eşîra Hesenan bi wan da zanîn.

Piştî ku, ji girtina azayên sazmanê bê hêvî bûn, nas kirin ku bi wê hêzdarîya silehên eşîran tu havilan bi dest nexin, hingê ji tevaya eşayîrên kurd sileh xwestin. Lê tevaya eşayîran bi sertî bersiva nedayîna sileh dane tirkan. Ji kolordûya Erzeromê Bînbaşî Alî Saib (Ew Alî Saib di 1925'an de mudeyî (dozgerê) mehkemeya îstiklalê ya leşkerî bû. Di wan sê salan de bi deh he-


zaran kurd îdam kirin; çawa ew bi xwe Xalid Beg jî îdam kir. Lê ew gunchê ku Xalid beg di sala 1916'an de esrarê (sîrên) Şêx Seîd û Evdurezaq Beg dane Nûrî Weysî, hingê xwest ku bi destê tirkan xwe û mîletê xwe bide îdamkirin.) bi leqeba Kel Alî Beg ku raspotînekî Kemal bû, bi hezar leşkerî çû gundê Xalid Begê Hesênî. Bi wî leşkerî, dor li gund pêça û çend zabit pê re çûn dîwana Xalid Beg, ji bo ku ew jidesthîlanînê bikeve Alî Saib bi hêrs û bi dengê eskerî ji Xalid Beg re got: “Xalid, em ji we sileh dixwazin hûn guhên xwe ker dikin, bêyî vir de û wê de divê tu tevaya silehên eşîra xwe bîni û teslîm bikî, an na emê te û yên wekî te edeb bi-

kin.” Li ser wê ziman dirêjîya wî, Xalid Beg şeşgir ji ber xwe kişand û xiste devê wî û gotê: “Hey serseriyê bê-edeb tu li hemberî kê dipeyivî? Ezê niha mejiyê te bikim dew.” Zibatên hevalên wî bi hev re gotin: “Xalid Beg em ji te rica dikin, Alî Saib ne bi heşê xwe ye, berî em bigihine virê, eraq vexwar.”

Xalid Beg deng li peyayên xwe kir û got: “Van tevan bigirin.” Her peyayek li ser zabitekî peya bû û bi pêsîra wan girtin û piştî wan li dîwar dan. Xalid Beg jê re got: “Ji leşkerên xwe re kaxezek binivîse û bişîne bila ji gund pênc kîlometre bi dûr kevin. Hûnê jî bigihîne wan, an em di vir de we tevan bi ser hev de bikujin, çawa ku yek tenê jî, ji

Koçberî

CELALETTİN YÖYLER



Di pey her koçberî re serkeftinê mezin çêbûne. Di dîroka gel û neteweyan de koçberî her bi têkoşîn û berxwedan e. Wekî çawa ku koçberiya gelê kurd jî ji ber têkoşîna wî ya bi rûmet û berxwedana wî, mala wî tê şewitandin, mal û warê wî ji dest tê girtin. Lê dîsa jî ew li hemberî sitemkaran serî natewîne, destê xwe ber bi jor bilind nake, nabêje: “Ez jî wekî te me.”

Koçkirina gelan û kesana di pêvajoya dîrokê de pir birûmet û manîdar e. Mînak; koçberiya Mûsa û Mihemed pêxember (silava Xwedê li ser wan be). Wan her du pêxemberan ji bo ku gelê xwe ji bêdadî û sitembariya mêtinkar û xwînxwaran rizgar bikin, riya koçberiyê dane ber xwe.

Bi rastî jî di navbera koçberiya van her du pêxemberan û koçberiya gelê kurd de zêde cudatî nîn e. Heke cudatiyeke biçûk hebe jî, ew jî rengê mêtinkariya li ser wan e. Mêtîngeriya dema pêxemberan, bi

rengê lipaşmayî bû, lê rengê mêtîngerî û kedxwariya li ser kurdan hemdem e. Mêtîngerên hemdem, karê xwe bi hostatî û nuxamtî dimeşînin. Mirovan dikujin, lê paşê diavêjin ser xelkê, di ser de jî dibêjin, “Em heyfa wan li ser nahêlin.” Ev jî gotina, “Bi guran re dixwe, bi xwedî re şînê dîke” tîne bîra mirov. Hem jî wekî bûyera Yusuf û Zuleyxayê ye. Zuleyxa dixwaze ku Yusuf pê re bibe heval û wekî daxwaza wê tevbigere, lê Yusuf ji ber tirs û fedîkirina ji Xwedê, jê direve.

Di dema revê de Zuleyxa bi kirasê wî ji paş ve digire û wî ber bi xwe ve dikişîne, lê Yusuf jî tim dixwaze xwe ji destê wê ve berrêde. Kirasê Yusuf diçire, di vê demê de Ezîzê Misirê, mêrê Zuleyxayê li ber derî amade dibe û li derî dixwe, dema Zuleyxa bi mêrê xwe dihese, hema dixwe qêr û hawar dibêje: “Yusif dest avêtiye min.” Ji vê rewşê re ereb dibêjin: “Derebenê we beka sebeqanî we îştêka”, ango li min da û bixwe girî, berî min çû giliyê. Rewşa gelê kurd jî wekî vê mînakê ye. Hov û tebayên nijadperestên bêxwedê vî gelî dikujin û dişewitînin, lê bi ser de jî ji raya gelê cîhanê re dibêjin: “Hinekên din kesên me

kuştine û bi agiravêjê şewitandine. Hûn çima li kesên ku hemwelatîyên me dişewitînin dibin xwedî.”

Â ez jî wê rewşê re dibêjim hov û mêtîngeriya hemdemî. Lewre hovên di dema Mûsa pêxember û Mihemed pêxember de hovên kevnare bûn. Cudatiya di navbera her du hovan de evqas e. Mêtîngerên li ser serê vî gelî hemdem in, ên dema Ebûcehl û Firawn jî kevnare ne. Her wiha jî koçberiya gelê kurd wekî, koçberiya Mûsa û Mihemed e (silava Xwedê li ser be). Lewre koçberiya gelê kurd ji ber têkoşîn û liberxwedana wî ye, koçberiya Mûsa û Mihemed Pêxember jî li hemberî Firawn û Ebûcehl û Utbe û Şeybe û Welîd e.

Dîsa bila herkes bizanibe ku tim li pey koçberiyên serkeftinê mezin çêbûne. Mihemed Pêxember ji ber sitemkariya mêtîngiran koç kir, çû Medîneyê. Dû re zivirî warê xwe yê berê, Meke fetih kir. Gelê kurd jî wê rojekê her bi serkeftin bizivire warê bav û kalên xwe. Lewre di dîroka gelan de çiqas tengahî çêbûye, li pey wê firehî derketiye holê; çiqas bûye êvar, li pey wê roj derketiye; çiqas bûye ewr, li dû wê sayî derketiye.

Firok û Dayika Fatê

Dayika Fatê, yeke gundî ye. Jiyana wê li wir derbas bûye. Wê başbaş traktor jî nedîtiye, lê li firokê (helikopterê) siwar bûye. De ka em bala xwe bidine Dayika Fatê vê rewşa xwe bi çi ve girê dide.

Gundê Dayika Fatê, gundekî çiya ye, hem jî çiyayekî asê û dijwar e. Li gundê wê qereqol jî hebûye.

Rojekê bûka Dayika Fatê dikeve ber halê xwe. Bûka Fatê pir li ber xwe dide, lê dikeve rewşeke perişan. Gundiyên Dayika Fatê xeberê didin Fermandarê Qereqolê û rewşa bûka Fatê jê re dibêjin. Fermandarê qereqolê jî, bi bêtêla xwe firokê dixwaze.

Bi fermana Fermandarê Qereqolê, firok tê gund ku bûka Dayika Fatê bibe nexweşxaneyê. Dayika Fatê û bûka wê li firokê siwar dikin û firok bilind dibe. Gava ku firok ber bi asîmanan ve bilind dibe, Dayika Fatê destê xwe ber bi Xwedê ve radike, duayan dike û ji xwe re bi deng wiha dibêje:

– Yarebî! Tu emrê Apo li ser qencyê zêde bikî û her li ser serê me kurdan be. Wa em bi xêra Apo li firokê jî siwar dibin.

Fermandarê Qereqolê dengê Dayika Fatê dibihîse. Ji leşkerekî ku bi kurdî dizane, dipirse “oğlum baksana, Fatê ana ne diyor. Apo mapodan bahsediyor”. (Ka binêre kurê min, Dayikê Fatê çi dibêje, qala Apo mapo dike?)

Leşkerê ku bi kurdî dizane gotinên Dayika Fatê ji yê fermanar re werdigerîne. Yê fermanar jî,

ji yê leşker re dibêje:

– Fatê anaya söyle, bu helikopter Apo'nun değil. Büyük T.C.'nin dir. Devlet onların hizmetine sunmuştur, sırf gelini için ta nerelerden getirtmişim. Türkiye Cumhuriyeti büyüktür. Hadi söyle.” (Ji Dayika Fatê re bibêje ku ev firok, ne ya Apo ye. Ya TC'ya mezin e. Dewletê ew xistiye xizmeta wan, tenê ji bo bûka wê me ji ta ku aniye. Komara tirk mezin e. Ka jê re bibêje.)


Leşker van gotinên fermandarê xwe ji Dayika Fatê re dibêje.

Dayika Fatê jî, ji leşkerê kurd re dibêje: – Kurê min yê delal û nezan, tu jî, ji kumandare xwe re bibêje ku Dayika Fatê jî baş dizane ev firok ne ya Apo ye. Lê hînga Apo tune bûya, me bi çavê xwe traktor nedidîtin. Ev îro bi xêra wan, me li firokên xwe siwar dikin. Ma qey ez ne dînim. Ez jî hin tiştan li gorî xwe dizanim kurê min.”

Ku Dayika Fatê van gotinan ji leşker re dibêje, leşker jî gotinên wê ji fermandarê xwe re werdigerîne. Yê fermanar ku bi gotina leşkerê xwe hîn dibe, serê xwe dihejîne, li ser leşker difetile û wiha dibêje.

– Vay be! Allah kahretsin. Demeki öyle ha!... Yaşlıları bile bu bilince vardılarsa işimiz yaştır. Vallahide billahide işimiz yaştır. (Xwedê belaya xwe bidê, demek wisa ye ha! Heke pîrên wan gihîştibin vê radeyê, welehî, bilehî karê me zehf dijwar e.)

SEMYAN CIZÎRÎ



XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (5)

XAÇEPIRS

K	O	A	E	Ü	Ya					
L	E	Y	L	A	Z	Â	N	A	Lêvegirtî	A
V	A	V	T	A	M	Î	N			
Î	N	T	E	N	E	Î	R	A	Îrdiyarî	
A	D	E	S	E	H	A	D	Î		
A	R	Î	T	N	E	Z	Ê	B		
E	M	B	A	Z	S					
H	E	Ü	A	N	Î					
Ö	N	S	N	A	N					
Ê	S	E	R	A	S	E				

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsê (3)


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 5'an qaseta. Gulên Mezrabotan “Ji dinê re Aşti” ye. **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixrandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 3'an, qaseta **Şakiro 'Helîmcan'** ê qezenc kirine: **Ahmet Koç/Muş, Kadir Yalçın/Izmir, Hizniye Qaso/Batman, Gever Kaya/Bursa, Sabih Gümüşsoy/Izmir, Nadir İris/Şanlıurfa, Welat Yavuz/Manisa, Mehmet Yıldız/Diyarbakır, Hakan Tekin/Diyarbakır, Zerdeşt Cengiz/Amasya**

Gîrfan	Kesê ji dema Pêx. Hunermendek (wêne)	Oksîjen	Sewaleke avî	Xelk	Berbang
Mecbûr			Bakelorya	Bajarek li Pakîstanê	
			Pîrozgeha Yêzîdiyan		
Gîyan		Broşur			
Kulîlkek		Pêxember			
			Hejmarek		Notayek
			Paytexta Peşûyê		
Îlaheya bereketê				Baneşana Îspanyolan	
Gihane kek				Fêkiyek	
	Mîndal		Dewletek		
	Eşq, sewda		Yanê		
Plaqa Misirê		Bawerî			
Gel		Termeke setrencê			
			Partiya Mandela		
			Notayek		
Int					
Rojek			Sewalek		
		Çiyayek li Çukurovayê			

PEYVA VEŞARÎ





MED televîzyona me hemûyan e

Destpêk rûpel 8-9

Bakurê welêt hêj xwe ji ruhiyeta Tirkîyeyê xelas nekiriye. Hunermendên Bakur, divê berî her tiştî kurdiya xwe baş bikin, gerek li ser zimanê kurdî pir xebitin. Ew hunermendên kurd bin, gerek kurdiya wan tekûz be, tekûz muzîka kurdî bizanibin, ruhiyeta wan kurdî be, ku bikaribin berhemên kurdî yên baş biafirînin. Ibrahim Tatlıses bi eslê xwe kurd e, lê hunermendekî tirk e, yanî Aram Tigran bi eslê xwe ermen e, lê hunermendekî kurd e. Ji ber ku kurdî pir baş dizane û ruhiyeta wî kurdî ye, stranên kurdî pir xweş dibêje. Yekî ku dibêje ez hunermendê filan miletî me, divê zimanê wî miletî baş zanibe û ruhê wî, ruhê wî miletî be. Û baş xebitîye, baş bixebite... Li ser vê yekê, ez hunermendên Bakur rexne dikim...

Gelek kes telefoni MED-TV'yê dikin dibêjin "Hûn bo çi Şivan dernaxine televîzyonê?", hinek kes jî dixwazin ku wî binî we dernexin. Bêpîrsên MED'ê jî gotin deriyê me ji kesî re negirtiye. Li ser vê pîrsê hûnê çi bibêjin?

● Miletê kurd ji bo vê gelek bedel daye û bi rastî televîzyoneke wiha çêkirin ne hêsan e û ez wan însanan pîroz dikim, ku televîzyoneke wiha çêkirine... Ji wan jî pir hez dikim. Û ez pir hez dikim, dixwazim ku MED-TV bi pêşî keve... Lê divê mantalîte jî hinekî

were guhertin. Divê em hinekî ji hev re bi tolerans bin, em bikaribin hevdû rexne jî bikin, hinekî demokrat bin, em karibin alikariyê hev û dî jî bikin. Em li hemberî dijminên xwe sext û bi înad bin... Em hevalên hev in, dostên hev in, gelê hev in... Ez her gav dikarim ji wan re şowan jî çêkim. Ez piştgiya wan dikim, wan pîroz dikim, lê divê mantalîte were guhartin...

Rexneyên we hebin jî, îro televîzyoneke kurdan tenê heye ku li hemû parçeyên Kurdistanê weşanê dike, ew jî MED-TV ye. Ji bo vê jî be, ne gerek e ku hûn derkevin?

● Belê, gerek e... Lê ez jî dibêjim li gorî min programan bidine min, ez çêbikim. Ew dibêjin; tembûra xwe hilde were rûnê û stranên bibêje. Ew kesên ku tembûra xwe radikin û diçin, pir serfiraz nabin.

Ez dibêjim; ez vê programê wiha dixwazim, wiha bikin, derxin. Çi mesela? Klîp çêkim, çi mesela; şowên baş çêkim, çi mesela; sê-çar kamerayên xwe bigirin, konserêke mezin çêkin û li gorî wê mirovan derxin. Ez tiştên basît naxwazim. Ezê derkevim... ezê çêkim... Heta ku mantalîte were guhertin.

Yanê em dikarin bibêjin ku emê we di demê ne dîvdîrêjê de di MED'ê de bibinin?

● Helbet... Televîzyona me ye bavê min, ji bo çî? Ê ku li dijî vî tiştî be, ne

welatperwer e ha... Ez ne li dijî vî tiştî me, ez li dijî mentalîta wan im. Ev jî, ji bo selametiya miletê kurd e. Yanê ne ji bo şexsê min û filan bêvan e... Ez dixwazim ku gava di nava kurdan de tenakuz çêdibin (ez hêvîdar im ku tu car çenebe) wekî hozanekî ez bikaribim hemû kesî rexne bikim. Rexneyên min ne ji bo xerabiyê ne, ji bo çêkirinê ne... Ku kurdek dibêje ez bi stranên Şivan hişyar bûm, divê dilê wan pê xweş bibe. Şivan-gavan, elo-welo... yek ku vê xizmetê dike, xebatê dike, mirov divê pê dilxweş bibe. Bo çî ji min aciz in? Ez dixwazim layiqî miletê xwe bim. Hinek dibêjin ji pereyan hez dike, nizanîm çî... Min pere ji kesî nexwestiye, tiştêkî werê tune ye. Ez ji gişan jî feqîrtir im ha.. Ne cixara min heye, ne alkola min heye... Tirk, Zeki Müren hem îbne dikin, hem jî dibêjin "sanat güneşimiz", ê baş e, min çî kiriye? Ez tê nagihêjim...

● *Ez ne şaş bim, we carekê di radyoya BBC'yê de digot: "Ez dixwazim rockê çêkim", di vî warî de xebateke we çêbû gelo, ya jî xebateke we ya bi vî rengî çêbûye?*

-Tu vê muheqeq binivîsî... Di bingeha muzîka kurdî de rîtmên pir baş hene. Hin rîtm hene; ji rock, ji rep, ya jî ji hîpop jî xweştir in. Tu gava li "Kî ne Em" dinîhêrî, min 18 sal berê gotiye û ew bi xwe hîpop e yan jî rep e. Yan jî em bibêjin hereket e, rock e. Hîpopê ev

deh-doze sal in dest pê kiriye. Û heger ez hunermendekî îngilîz yan jî amerîkî bûma; ezê bibûma bavê hîpopê, ji ber ku "Kî ne Em" bi xwe bi vê rîtmê ye. Armanca me ne rock gotin û filan bêvan e. Em dixwazin muzîka kurdî bi hereket bikin, dewlementir bikin. Min xwestibû ez vê bibêjim. Tabî mirov divê teknîkên muzîka ewrûpî, armaniya muzîka ewrûpî bi kar bîne, ev ne tiştêkî xerab e. Muzîka me zengîntir, xweşiktir dike. Di kasetê min a dawî de gelek armanî hene, rengin e...

Di nav hunermendên îro de yên ku hûn dicibînin hene, ku hebin kî ne?

● Ez naxwazim navan bibêjim. Her kesekî di warê xwe de tiştêkî dike. Her yek rengîniyeke xwe heye, xweşiyeke xwe heye. Û roj bi roj wê bêhtir bi pêş bikevin. Li hemû Kurdistanê yên ku xwe tê gihîştine hene, lê bi taybetî li bakurê Kurdistanê lazim e bêhtir bixebitin, ji ber ku heta vê rojê jî, kes min îkna nake, min têr nake, ez naxwazim bi nav bikim. Biborin ez wan kêr, wan biçûk nabînim. Lê ez hîn Kawis Axa guhdarî dikim. Lê ez dikarim pir baş Ezîz Şarux guhdarî bikim, ez dikarim pir baş Tahîr Tewfîq guhdarî bikim. Ew min hinekî îkna dikin. Lê li Bakur ruhiyeta wan lazim e bêhtir kûr bibe... Hinek hene tiştên modern û klasîk li hev diqulîbînin, mirov dikare li wan teqdir bike.

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerîndeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR
Bêpîrsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Bêpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBĐ)

Jiyan li her derê jiyan e lê bi çi rengî?

Ber bi esirê ve, giregira kamyon û traktorên karkerên jin ku ji xebata bexçeyên porteqalan tên, gengeşiya jinên ser tenûrê qut dike. Jinên li ser tenûrê nanên germ qet dikin, li avê dixin û dirêjî karkeran dikin. Lê zilamên wan?



1 9 Mayıs yek ji taxên kurdan e, ku derdorên metropola Edeneyê wekî kincên qetiyayî pêçane. Tax di navbera taxeke erebên Edeneyê, ku jê re “ereb uşaxî an jî felah” tê gotin û Goristana Asrî de ye. Li bakurê rojhilata goristanê jî Balefirgeha Leşkerî ya Amerîkayê, Încirlik heye. Balefirgeha ku di krîza Iraq û welatên Rojavayê de bi nav û deng dabû.

Ev der ji aliyê stratejîk ve girîng e. Kurd li vê taxê jî, di bin tehde û kotekiya panzerên tirk de ne. Lê tenê bi dengê xwe be jî, balefirên Amerîkayê ji ber ku balefirên tirk ên ku gundên wan bombebaran kiribûn tînin bîra wan, dibe sedemê bêmorali û qehrê. Dîsa jî di taxê de, jiyan didome. Jiyan wan peyva “Kurd li her derê kurd e” tîne bîra mirov.

Jinek; navê wê ne diyar e, dibe ku Xezal, Nazê,

Gulê an jî Xecê be. Lê, navê cografyaya wê mîna avê zelal e. Rengê teştê wê ya sor, evîna dilê gelê wê tîne zimên. Ji welatê xwe dûr e, di nav vê dûrbûnê de jî şîn û şahî, ken û girîn, hebûn û tunebûn; bi destê hev girtine, satil di mil de ber bi bêriyê ve diçin, bêritiya bêrivan û dayikan.

Çawa ku xortên ciwan û keçên hejinzirav, bi dil û ruhekî zarokî gavên xwe ber bi dilanan ve diavêjin, ew jî bi vî rengî gavan ber bi tenûra axsor ve diavêje. Bi qirş û mirşên derdorê, tenûra wê ya sar û cemidî bi agir geş dibe. Her çiqas ev agir, gundên wêran û malên şewitî bîne bîra xaleta (xaltîka) me ya bînav jî, ji bo vegera ser axa bav û dapîran hêviya wê xurt dike. Hêviya ku bi hêstîrên çavan û xwêdana eniya xwe çêkiribû, vê gavê jî, li tenûra sor dixê, gilî û gazincên xwe jî pê re.

Tebleya li ber tenûrê, bi tekelên teqiyayî, sermiyandariya Meta Eysê û keça wê ya weremî (totmayî) dike. Meta Eysê piştî mirina mêrê xwe bi şêst û pênc saliya xwe, serê sibehê diçe ber tebleyê û ber bi banga mexrebê jî tê malê. Ew bi tenê li ser tebleya xwe mirîşkên sax difiroşe. Wê li Kurdistanê xwedîtî li berx û beranên bêhejmar dikir, lê vê gavê debara xwe bi firotina çend “mirîşkên ziraetê” dike.

Piştî demekê, hejmara jinên li ser tenûrê zêde dibin. Dîsa dest bi nîqaş û serpêhatiyên xwe dikin. Bingeşa nîqaşa wan, li ser rewşa

welatê wan, şerê qirêj û daxwaza aştiyêke birûmet e. Meta Eysê, tu car serkêşiya nîqaşan ji dest xwe dernaxe, ji ber ku di nav jinan de, ji aliyê temenê xwe ve ya herî mezin e.

Ber bi esirê ve, giregira kamyon û traktorên karkerên jin ku ji xebata bexçeyên porteqalan tên, gengeşiya jinên ser tenûrê qut dike. Jinên li ser tenûrê nanên germ qet dikin, li avê dixin û dirêjî karkeran dikin. Lê zilamên wan?

Ew ên ji kar û xebatên xwe hatine, li ber siya diwarê Mizgefta Sêrtiyan kom bûne, guhên xwe didine rojnameya “Azadiya Welat” ku ji hêla Haciyê dikandar ve tê xwendin. Li hemberî wan, zarokên 10–15 salî li meydana topê bi birê û sêgavê dilîzin. Sadiqê penêrfiroş, dev ji tebleya xwe berdaye û bi çavên matmayî li zarokan temase dike. Roj hinek maye ku her ava bibe. Dibe ku dîsa wekî her car dengê banga mele û dengê firokeyên ku ji balefirgeha Încirlikê radibin tevlihev bibin. Mele bang dide, ber tenûrê vala bûye. Meta Eysê bi alikariya cîrana xwe “Meqbûleya Bêar” mirîşkên xwe dixê qefesê, ku bibe malê. Ji zilaman kesên pîr diçin mizgeftê û hinek jî soz didine hev, ku êvarê herin mala Xalê Xelîl ber MED’ê.

Belê ev dîmenên jorê, li metropola Edeneyê taxa 19 Mayısê kurtedemeke jiyanê ye. Kurdistanîyên ku koçber li vê derê, li dijî helandin û tunebûnê, têkoşîneke xurt û manîdar didin. Piraniya wan bi rojan di bin îşkenceyên giran de mane, di zindanan de girtiyên wan, li serê çiya şervanên wan hene. Nivînen şehîdên xwe jî, di dilê xwe de raxistine. Di dawiyê de diyar dikin ku dûrbûna ji welat xiyaret e, divê ew di rojêke nêzik de vegerin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

